



KNK Bulten

Bultena Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê * Hj.: 1 * Kanûn 2006

KNKyê bi kombûna giştî ya Gulana 2006ê ve, xwe reorganîze kir

KNKyê di kombûna xwe ya 6. ya li 13-14yê Gulana 2006ê, li Brukselê da, programeke nû dana ber xwe û di struktura xwe da guhorînên giring pêkînan. Kombûna 6. bû platforma reorganîzasyona KNKyê ji bo demê nû. Di serî da, li destûr û peyman a xwe li goreyî şert û hewcehîyên demê nû guhorîn kirin. Hejmara endam û komîsyonan kêr kirin. Di warê temsîliyete da normên demokratîk binecihtir kirin. Em destûr û peyman a nû di bultenê da nawişînin, çiku ew dê bi serê xwe wekî broşûr cuda bêne weşandin. Me tinê xwast guhorînên têda hatine kirin bi we xwawendanan bidine zanîn. Belê biryarên kombûna giştî di bultenê da cih digirin ku nîşaneyên reform û reorganîzasyona KNKyê têda tene dîtin. KNK di vî demê nû da, dê li goreyî peyman û destûra nûkirî, hewil bide ku xwe bigihîne hemû element û dînamîkên neteweyî û vî potansiyela neteweyî di bin sihwaneya xwe da bîne nik hev. Bulten jî dê vî dengê komker bi we ra bigihîne. Tête hevî kirin ku hemû reng û dengên cuda yê neteweyî û kêmanîyên Kurdistanê di bin banê KNKyê da bibine dengê xurt yê neteweyê Kurd û xelkên li Kurdistanê dijîn.

KNK Bulten

Kombûna giştî ya KNKyê di 13-14yê Gulana 2006ê da li Brukselê pêkhat

Serokê KNKyê Elî Yigit, digel axivtina vekirina kombûnê, rapora komîteya rêvebir jî pêşkêş kir... Em li jêr birek ji wê axivtinê didin...

Dîwana birêz,
Endamên hêja,

Li ser navê komîteya rêvebir em bi hurmet silava li we teva dikin û dibêjim civata giştî ya 6. ya KNKyê li we hemiyar pîroz be. Hûn tev bi xêr hatine.

Piştî demekî dirêj em carek din, ji bo berdewamkirina karên xwe yê neteweyî ligel hev in. Ev tiştêkî pîroz û bi rûmet e. Di vî demê derbas bûyê de, me weke komîte di aliyekî de kar û xebatên ji bo hîlbijartinê meşand in û ji aliyê din ve jî xebatên bi navê KNKyê, ne bi awayekî xurt bê jî, me berdewam kirin.

Me weke komîte hewil da ku, em bikaribin vê civînê di demekî hin zûtir de pêkbînin. Lê belê ji ber hindê sedemên ne di destê me de û rewşa giştî me karê xwe di demê wê de pêk neanî. Elbet weke komîteya amadekar me jî dixwest karê xwe gor ku dihate xwestin bimeşînin û di demê wê de vê civînê pêkbînin. Lê belê ji ber wan sedeman civîn nebû. Lewra ev civîn wiha dereng ket. Em ji ber vê yekê ji we hemûyan lêborîne dixwazin.

Dîwana birêz, Parlementerên hêja,

Em dixwazin hinekî li ser kar û xebatên komîteyê meşandine bisekinin û civata giştî agahdar bikin.

Piştî civîna giştî ya 5. ku di sala 2004an de pêk hat, li ser esasê biryarên civata giştî me xebatên xwe dan destpêkirin. Berî her tiştî piştî civatê em hatin cem hev û me rêzek biryar girtin.

Di destpêkê de me ji tevahîya partiyên Kurdan re name şandin. Di wan nameyan de me ji wan hevdîtin xwest. Armanca me daxwaza hatina cemhev bû. Daxwaz ew bû ku em bêne gel hev û li ser esasê meşandina siyasetek hevbeş di nav dezgehekî neteweyî de xebatekê bimeşînin. Ji aliyê din ve me têkilî bi dezgehên neteweyî û şexsîyetan re jî dan dest pê kirin.

Piştî şandina nameyan, me tu bersivê pozîtîf mixabin wernegirt. Tenê Kongreya-Gel, Partiya Jiyana Azad ya Kurdistanê (PJAK), Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD), Partiya Azadiya Jinên Kurdistanê (PAJK), Partiya Çareserîya Demokratîk ji bo Kurdistanê (PÇDK), Konfederasyona Komeleyên Kurd li Ewropa (Kon-Kurd), Partiya Çepên Kurd yê Sûriyeyê, Enstîtuyên Kurd, Federasyona Elewîyan, Civata Islamî ya Kurdistanê, Yekîtiya Êzdîyên Kurdistanê bersiva me bi erênî dan. Ji ber van hemî sedeman me rewşa sazî û şexsîyetan li ber çav girt û hîlbijartin jî gor wê rewşê pêk anîn.

Endamên birêz,

Weke hûn dizanin di destpêka avakirina KNKyê de armanca me tim ew bû ku em tevahî partiyên Kurdan bînin gel hev û bi hev re kar û xebateke neteweyî bidin meşandin. Her çiqas em tam bi serneketibin jî, cara yekemîn e me karîbû ji her çar parçeyên Kurdistanê ew qas partî û sazîyên neteweyî û şexsîyetên Kurdistanî bînin gel hev. Em niha li vir dixwazin dezgehekî neteweyî bi vî awayî avabikin. Divêt were zanîn ku ev karê me, yê ku em niha pêk

tînin, weke gaveke dîrokî û pîroz e...

...

Ev prosesa ku em têde derbas dibin, bi alozî be jî, ew xwedî wateyek pir giring e. Di cîhanê de û her waha di herêma Rojhilatanavîn de bûyerên giring diqewimin. Weke tê zanîn, li Iraqê hîlbijartinên nû çêbûn. Pir partiyên Kurdan bi listeyek hevbeş tev li hîlbijartinan bûn. Gor encamên wan hîlbijartinan Kurd di parlemena Iraqê de bûn xwedî hêzeke giranbiha. Di herêma Kurdistanê de parlamento û hukumeta hevbeş ji bo Federasyona Kurdistanê pêk hat. Em van pêşketinan weke nîrxên gelê Kurd dibînin û dipejirînin.

Li vê herêma Kurdistanê herdu partiyên sereke yê Kurdan, PDK û YNK bi hev re hevkarî kirin û em hêvîdar in ku dê ev hevkarî berdewam bike. Serokê Federasyona Herêma Kurdistan birêz Mesut Barzanî, di gotareke xwe de diyar kir ku, « êdî ne mumkun e ku di navbera hêzên Kurdan de şer derkeve ». Ev weke pêşketineke giring e û em jî weke KNK xwedî hêvî û armançeke wisa ne. Her çiqas jî hêj kêmasîyên Federasyona Başûra Kurdistanê hebin jî, cara yekem e ku bi vî awahî Kurd ji hev re dibin alîkar. Heman pêşketin jî bo parçeyên Kurdistanê yê din jî xwedî wate ye. Di vê prosesê de heman pêşketin dikarin ji bo xebatên KNKyê jî bibin alîkar.

Digel meşandina tekoşîna azadî û demokrasîyê li parçeyên din yê Kurdistanê, hêj jî zilm û zora dewletên serdest li ser gelê me didome. Li Tirkîyeyê, di aliyekî de tecrîta dewletê li ser Serokê Koma Komalên Kurdistanê birêz Abdullah Ocalan dimeşe, di aliyê din de jî bi hemî derfetên dewletê şerekî qirêj li hember gelê Kurd tête meşandin. Bi vî munasebetê em nêzîkatîya dewleta Tirk ya li hember Serokê Koma Komalên Kurdistanê şermezar dikin û dibêjin pêwîst e dewleta Tirk dev ji wan rêbazên xwe yê qirêj berde.

Di bûyerên dawî yê li Kurdistanê pêkhatin de jî baş derkete holê ku, taybetî serleşkerîya Tirk bi biryar li ser gelê Kurd de diçe û siyaseta înkarkirin û pelçiqandinê didome. Tevahîya gelê Kurd bûye hedefa hêzên dewleta Tirk. Zarok, jin û kalên me têne kuştin. Ev hewildan tenê li Tirkîyeyê nayên meşandin, her waha di qada navneteweyî de jî dewleta Tirk ketîye nava hewildanekî qirêj.

Li Iranê jî, dewleta melayan ketîye nava prosesek êrişan li hember gelê me. Digel van êrişan, gelê me yê Rojhilatê tekoşîna xwe ya ji bo Azadî û Demokrasîyê berdewam dike û roj bi roj pêş dixê. Gor tê dîtin, hêj

diçe nakokî di navbera Iran û Neteweyên Yekbûyî de zêdetir dibin. Bi vê rewşê ve girêdahî, hêvîyên ji bo guhertinan li Iranê hêj zêdetir dibin.

Li Sûriyeyê jî rewş zêde cûda nîne. Li vî parçeyê Kurdistanê jî gelê Kurd tim di nava tekoşînê de bûye û berdewam dike. Digel hemî zor û zexta dewleta Sûriyeyê, gelê me yê Başûrrojavayê tekoşîna xwe ya ji bo Azadî û Demokrasîyê pêş dixê û dê ber bi encamekê ve bibe. Weke KNK em jî, bi her awahî li gel tekoşîna her çar parçeyên Kurdistanê ne. Karê me yê esas ev e û divê em li ser van berpirsariyên xwe bisekinin.

Dîwana birêz, Endamên hêja,

Bi girtina ber çavan ya rewşa sîyasî û rewşa gelê me, em hêvîdar in ku di vê civîna me de dê nîqaşên xurt werin kirin. Ji bo çareserîya pirsgerêka me biryarên hêja werin pêşxistin û em ji vê civînê bi biryar derkevin.

Li ser vî esasî em careke din silava li we hemîyan dikin û dibêjin ku em hêvîdar in ev civîn bi serkeftin derbas be. Digel rêz û silavên germ.

Komîteya Rêvebir ya KNKyê

13. 05. 2006

«... Piştî şandina nameyan, me tu bersivêk pozîtîf mixabin wernegirt. Tenê Kongreya-Gel, Partîya Jiyana Azad ya Kurdistanê (PJAK), Partîya Yekîtiya Demokrat (PYD), Partîya Azadîya Jinên Kurdîstanê (PAJK), Partîya Çareserîya Demokratîk ji bo Kurdîstanê (PÇDK), Konfederasyona Komeleyên Kurd li Ewropa (Kon-Kurd), Partîya Çepên Kurd yê Sûriyeyê, Enstîtuyên Kurd, Federasyona Elewîyan, Civata Islamî ya Kurdîstanê, Yekîtiya Êzdîyên Kurdîstanê bersiva me bi erênî dan. Ji ber van hemî sedeman me rewşa sazî û şexsîyetan li ber çav girt û hîlbijartin jî gor wê rewşê pêk anîn...»

Daxuyaniya encama kombûna giştî ya KNKyê

Kombûna giştî ya 6. ya KNKyê li rojên 13-14ê Gulana 2006ê, di demekî gelek nazik û awarte da pêkhat. Kombûna giştî ev prosesa ku têtê jîyan li ser du xalên sereke analîz kir û gihîştê encam û biryarên gelek giring.

I. Rewşa cîhanê û rojhilatanavîn

Kombûna giştî ya KNKyê li ser rewşa cîhanê rawesta û gihîştê wê bawerîyê ku di roja îro da konfilîkta sereke di navbeyna hêzên demokrasîyê û antî demokratîk da ye. Ji cîhana rojavayê heta rojhilatê, ji cîhana bakur heta başûr di navbeyna hêzên demokrasîxwaz û antî demokratîk da tekoşîneke xurt û dijwar têtê dîtin. Di vê çarçoveyê da polîtîka Amerîkaya Yêkgirtî û bi giştî cîhana rojavayê ya spesîfîken li rojhilatanavîn, ku Kurdistan di nîveka vê cografîyê da cih digire, hate rawestan û gihîştê wê bawerîyê ku projeya Amerîkayê ya ji bo demokratîzekirina rojhilatanavîn tekabulî armancên mînimâl yê tekoşîna azadîya gelê Kurd dike û herwisa bawer dike ku ev projeye bêyî tifaqeke xurt ya digel bizava neteweyî ya gelê Kurd nikare bigihe armanca xwe û bal kêşa ser wê yêkê ku ev demokratîzekirin û bizava neteweyî ya gelê Kurd divê bi paralelî bête domandin. Destkevta Kurdîstana Başûr, wekî dewleteke federal, di vê kontekstê da hate biha kirin. Kongreyê destnîşan kir ku heke hêzên demokrasîwxaz yê navçeyê û cîhanê, xebat û hewildanên xwe di nav koordînasyonêke digel tekoşîna parçeyên Kurdîstanê da organîze bikin û paralelî bizava demokrasîxwaz ya xelkê Kurd bi pêş bêxin, hingê dê bigihin armanca xwe.

II. Rewşa Kurdîstanê

Li Kurdîstanê îro li parçeyê başûr sistemê kolonyalîzmê hatîye teswîye kirin û di nav Iraqa federal ya nû da dewleteke federal hatîye damezrandin. Li Kurdîstana Rojhilat tekoşîna xelkê me ya dijî rejîma Îranê gihîştîye qonaxê nû û pêşkevî. Herweha li Kurdîstana Bakur ji têkoşîneke gelek xurt ji hemû alîyan ve têtê dan beramberî rejîma Tirkîyeyê. Bi taybetî di Newroza îsal da gelê me bi milyonan xwe nîşanda û dawxazên xwe yê neteweyî û îradeya xwe bi dengê milyonan bilind kir. Li Sûriyeyê jî herwisa xelkê Kurd di nav têkoşîneke bi biryar da ye. Piştî ku Îraqa nû hate ava kirin û di nav vê dîzayna nû da Kurdîstana Başûr azad bû, Tirkîye, Îran û Sûriyeyê tifaqa xwe ya antî Kurd ji demên berê zêdetir aktîve kirin û di maksîmûm dereceyê

da pozisyoneke êrişkar wergirtin. Li goreyî vê rewşa nû konseptê xwe ya statûkoperes hilkêşane dereceya operasyonên leşkerî yê hevrayî. Xelkê Kurd bi taybetî li bakur û rojhilat beramberî vê erîşkarîya Îran û Tirkîyeyê berxwedaneke bilind nîşanda û eve didome. Rejîma Tirkîyeyê bi barbarîyeke nedîtî erîşî serhildana Amedê û bajêrên dî kir û di nav da zarok ji dehan zêdetir kes kuştin. Bi çekên kîmyayî gerîllayên Kurd şehîd kirin. Li Îranê jî xelkê me berxwedana xwe bilind kir û lewma rejîma Îranê jî bi hemû hêza xwe ya leşkerî erîşî binkeyên opozisyona Kurd kir. Îran û Tirkîye bi van erîşkarîyên di nav xwe da neman vê carê bi koordînasyoneke leşkerî erîşên xwe xurttir kirin. Îran û Tirkîyeyê bi vê erîşa koordîne xwastin hem bizava neteweyî teswîye bikin, hem jî destekta Kurdistanê Başûr hilgirin bin tehdîtên xwe û bizava bi giştî ya neteweyî ablûka û tengav bikin. Kombûna giştî ya KNKYê ev rewşa nû û erîşkarîya bi koordîne ya dewletên dagîrker bi xurtî şermizar kir û beramberî vê konseptê nû ya erîşkarîya bi koordîne ya dewletên dagîrker, zerûreta tifaqa navxweyî destnîşan kir û ji bo vê yêkê jî biryara tesîskirina tifaqa neteweyî wergirt. Kombûna giştî ya KNKYê herweha biryar wergirt, ku di demekî nêzik da bingehê Konferansa Neteweyî jî amade bike.

Kombûna giştî ya KNKYê “dubilmoral”îya Yêkîtîya Ewrûpayê [YE] jî ya beramberî erîşkarîya Tirkîyeyê ya li ser gelê Kurd, -ku Tirkîye namzeta YEyê ye-, bi bîr xist û hêvîya xwe dubare kir ku YEyê li bihayên xwe yê demokratîk xwudan derkeve.

Ji aliyê dî ve kombûna giştî ya KNKYê gelek bi spesîfîkî li ser politîka îmhakar ya dewleta Tirkîyeyê ya li ser rêberê KKK Abdulah Öcalan rawesta û biryar da ku bala bîr û rehîya giştî ya navxweyî û ya cîhanê bikêşe ser vê konseptê dewleta Tirkîyeyê.

Kombûna giştî ya KNKYê bi beşdarîya hemû endamên xwe ve pêkhat û rêvebirîyeke nû hilbijart. Li destûr û programa xwe reformên giring pêkînan û li goreyî vê nûbûnê organên xwe yê dî jî hilbijartin û programa xwe ya demê nû bi gelek biryarên têrker û objektîv ve xurttir kir.

Kombûna giştî ya KNKYê herwisa bihayekî mezin da xwudanderketina sembolên neteweyî û bi bawerîya hêvîyên xelkê Kurdistanê slogana yêkîtîya neteweyî bilind kir.

Kombûna giştî, bi vê bîr û bawerîyê û bi serkevtî bi dawî hat.

13 – 14 Gulana 2006, Bruksel

Di kombûna giştî da ji bo Konseya Rêvebir ya KNKYê ev nav hatin hilbijartin:

Serokê KNKYê: Ali Yigit

Endamên konseyê:

1. Tahir Kemalîzade
2. Gulistan Hecînesîbe
3. Adem Uzun
4. Rojan Hazim
5. Nizamettîn Toguç
6. Corc Aryo
7. Felemez Başboga
8. Nesîm Yaman
9. Hîwî Berwarî
10. Ferîde Abbasoğlu

“... Kombûna giştî ya KNKYê bi beşdarîya hemû endamên xwe ve pêkhat û rêvebirîyeke nû hilbijart. Li destûr û programa xwe reformên giring pêkînan û li goreyî vê nûbûnê organên xwe yê dî jî hilbijartin û programa xwe ya demê nû bi gelek biryarên têrker û objektîv ve xurttir kir...”

Biryarên kombûna giştî ya şeşemîn [6.] ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK], li 13-14yê Gulana 2006ê li Brukselê

Di vê kombûna giştî ya kongreyê da komisyonên ku kar û xebatên neteweyî organîze bikin û di pratîkê da di rê bibin hatin pêkînan:

1. Komisyona xabatên neteweyî
2. Komisyona karûbarên derve

3. Komisyona ziman û perwerdeyê
4. Komisyona civak, çand û hunerê
5. Komisyona xabatên jinan

1. Biryarên ku ji bo komisyona karûbarên derve:

1. Bi rêya rêxistin û komeleyên gelê me, bi organîzasyon û dezgehên polîtîk, kulturel, sosyal û ekonomîk ra, pêkînan peywendîyan.
2. Ji bo her perçeyekî Kurdistanê konferansên neteweyî û navneteweyî bêne organîze kirin.
3. Bi xwandekar û xwandevarên Kurd yê li dîasporayê têkilî bêne danan, ku ew jî bikarin bikevin nav xebata derve ya xwandevarên ku bêne perwerde kirin û ji bo wan konferans bêne çêkirin.
4. Di organîzasyonên navneteweyî û neteweyî da lobîyên mayînde bêne çêkirin.
5. Xebat bête kirin ku Kurd di hemû organîzasyonên polîtîk û sosyal da cih bigirin û ji bo yê heyî jî pêşengî bête kirin.
6. KNK, ji bo projeyên aborî û civakî yê welatî, di navbeyna organîzasyonên welat û yê derve da bibe pir û ji bo wê yêkê kar bike.
7. Pêdivî ye ku KNK rola xwe ya dîrokî bileyze û bikare ku dengê Kurd li Ewrûpa û timamî rojavayê bide bihîstin.
8. Hewce ye ku malpera KNKyê bête nûjen kirin û digel zaravayên Kurdî, zimanên bîyanî jî hebin.
9. Komîteyên dostên Kurdan bêne çêkirin û bi wan ra ji bo pêkînan û têgihandina rehîya giştî kar bêne kirin.
10. Ji bo afirandin û jîndekirina karûbaran projeyên finansê bêne amade kirin.
11. Bi polîtîker, ronakbîr û kesayetîyên binyat Kurd ra, yê ku hevvelatîyên dewletên dî ne, têkilî bête danan, daku di paşerojê da cihê xwe di organîzasyon û dezgehên neteweyî da bigirin.
12. Di meydana navneteweyî da dijî zulma dewleta Tirk û tecrîda li ser rêberê KKKyê Abdulah Ocalan, xebatên xurt û dorfireh bêne kirin.

2. Biryarên ji bo komisyona xebatên neteweyî:

1. Komîsyon daku di navbeyna partîyên Kurdî da diyalog bête danan û xurt kirin, kar bike.
2. Hewce ye ku komîsyon kombûnên gelî û

komîteyên diyalogê pêk bîne.

3. Ji bo propaganda û danasîna di TV û radiyoyê da komîteyêke aktîv bête danan.
4. Ji bo pêkînan konferanseke neteweyî amadekarîyên hewce bêne kirin.
5. Komîteyêke nû bête danan û bi hêzên polîtîk ra ji nû ve têkilî bêne pêkînan.
6. Ji bo pîrozîya cejna neteweyî, Newrozê, resepsiyon bête dayîn û organîzasyon û şexsîyetên Kurd û biyanî bêne vexwandin.
7. KNK ji bo xurtkirin û pêşvebirina sermayeyê neteweyî, dewlemend û kardêrên Kurd teşwîq bike.

3. Biryarên ji bo komisyona ziman û perwerdeyê:

1. Daku zimanê Kurdî di her xelesa jîyanê da serdest be û pêş bikeve û herweha di nav dewletên ku Kurdistan dagîr kirî da bête fermî kirin, digel hemû rêxistin û dezgehên neteweyî, kampanyaya zimanê Kurdî bête organîze kirin.
2. Têkilî û ragihandina navxweyî ya bi name, bang, vexwandin, e-mail, fax û hwd. bi zimanê Kurdî be.
3. Digel cih û dayreyên Yêkitîya Ewrûpayê [YE] yê bi ziman û perwerdeyê ve mijûl, peywendî bête danan daku zimanê Kurdî li goreyî formên YEyê bibe xwudanê statûyêke fermî di xwandingehan da.
4. Komîsyon hewil bide ku kes û alîyên bi ziman û perwerdeya bi zimanê Kurdî ve girêdayî bîne nik hev ku hem ziman û materyalên perwerdeyê bêne standart kirin, hem jî pirtûkên zarokan bêne destek kirin.

4. Biryarên ji bo komisyona civak, çand û hunerê:

1. Pêkînan lêkolînên li ser organîzasyon, dezgeh, kom û komeleyên ku xebatên civakî, çandî û hunerî dikin û amedekirina dosyayêke agahdarîyan ji bo piştgirî û bi hêz kirina wan.
2. Piştgirîya organîzasyonên ku kar û xebat û çalakîyan ji bo danasîna çand û hunera Kurdî di meydana navneteweyî da dikin.
3. Pêkînan lêkolînên li ser mana û ravekirina rojên neteweyî û cejnên dînî û bi rêya hemû baskên medyayê danasîna wan.
4. Destnîşankirin, pîrozkirin û nasandina bi gel ra ya rojên taybetî yê wekî bîrînan şehîdan, jenosîda Helebçe, heftîya qehremanîyê û hwd.

5. Xwudanderketina hemû biha û berhemên çand û hunera Kurdistanê yên dîrokî û pêkînan û xurtkirina hişmendîya parastina wan.
6. Piştgîrî û teşwîqkirina dem û dezgeh û kom û komeleyên ciwanan yên sosyal, kulturî, hunerî, pîşeyî, folklorî û sporê.
7. Cejnên gelên Kurdistanê û Mezopotamyayê bi awayekî fermî bêne qebûl kirin.

5. Biryarên ji bo komisyona jinan:

1. Pêdivî ye ku KNK azadîya jina Kurd wekî prensîpeke bingehîn bibîne û ji bo azadîya jina Kurd xebatê bike.
2. Pêdivî ye ku komisyona jina ya KNKYê ji bo pêkînana yêkitîya neteweyî roleke aktîv bileyze û bi rêya diyalog û bang û gazîyan, pêşengîya têkoşînê bike.
3. Daku zimanê Kurdî li Kurdistanê û her derê ku Kurd lê dijîn, bi şeweyê xwandin û nivîsînê di jiyane da pêş bikeve, divêt jina Kurd pêşengîyê bike.
4. Li hemberî şiddet û bi hêceta namusê kuştina jina Kurd, têkoşîn bête dan û herweha şiddeta manewî jî divêt ji aliyê KNKYê ve bête mehkûm û şermizar kirin.
5. KNK divêt li hemberî şûkirina [zewicîn] pêguhorkî û berdêlî û ya bi jîyekî biçûk û şûkirina bêdil û bi darê zorê û next û qelen û herweha dijî firotina leşê jinê bi xurtî bisekine û mehkûm û şermizar bike.
6. Komisyona jina ya KNKYê, ji bo çareserîya pîrsgirêkên jinên Kurd, digel organîzasyonên jinan têkelîyan xurt bike û bi hev ra li ser pîrsgirêkên jina Kurd û jinên cîhanê raweste û herweha divêt her jineke endama KNKYê li her welatekî ku lê dijî, têkelîyan bi rêxistinên jinan yên li wî welatî pêkbîne û ji bo vê yêkê jî konferans û civînên perwerdeyî amade bike.
7. Kesên du jin heyî nikarin bibine endamê KNKYê û herweha her endamekî KNKYê heke li ser jina xwe jineke dî bîne, ew ji endametîya KNKYê dê bikeve û dîsa her endamekî KNKYê ku şiddetê li ser jina xwe bi kar bîne dê ji aliyê KNKYê ve bête mehkûm û şermizar kirin û ji endametîyê bête derêxistin.

”... Kesên du jin heyî

nikarin bibine

endamê KNKYê û herweha

her endamekî KNKYê

heke li ser jina xwe

jineke dî bîne, ew ji

endametîya KNKYê

dê bikeve û dîsa her

endamekî KNKYê ku

şiddetê li ser jina xwe

bi kar bîne dê ji aliyê

KNKYê ve bête mehkûm

û şermizar kirin û

ji endametîyê bête

derêxistin...”

**Li jêr nivîsara li ser hewcehîya
yêkitîya neteweyî û pozîsyona KNKYê,**

didin:

**KNK û lezîniyeta tifaqa
navxweyî ya Kurdan**

ROJAN HAZIM

KNK [Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê] organîzasyonêke sihwanyê ya neteweyî ye. KNKYê tifaqa navxweyî bo xwe kirîye armanc ku biçûk mezin hemû organîzasyonên sosyokulturel, sosyopolîtîk û

sosyoekonomîk û herweha şexsîyetên neteweperwer û welatparêz di bin banê xwe da kom bike û hêz, şiyana û enerjîya wan ya neteweyî di warê têkoşîna bi giştî neteweyî da mobilîze bike û di kanalê neteweyî da di rê bibe. Eve teorîken armanceke rast û di cih da ye û temsîla hemû his û bîr û bawerîyên neteweyî dike. Belê ev armance di pratîkê da dê çawa û bi çi rengî bibe, divêt ew bête zelal û ron kirin.

Şik têda nîne ku gava mirov vê daxwaza hevpişk [hevpar] ya neteweyî dibîne, hizir dike ku karekî sanahî ye û hemû derûdorên neteweyî dê hema bibezin bêne bin banê organîzasyonêke ku eve bo xwe kirîye armanc... Lê mixabin ku pratîk ne wisa ye û sedan asteng, zor û zehmetî û giriftarî derdikevin pêşîyê...

Paradoksa rêxistinên polîtîk

Astenga herî mezin û sereke dîsa ve ji organîzasyonên polîtîk derdikeve. Biçûk mezin hemû organîzasyonên polîtîk yê di meydana polîtîka Kurdistanê da heyî, di programên xwe da xaleke hevpişk didanîne serî.

Çi ye ew xal?

Herçend her rêxistin bi jargona xwe formûle bike jî, lê naveroken yêk tişt e û wisa tete gotin: “Şoreşa Kurdistanê, şoreşeke neteweyî û demokratîk e û divêt hemû hêz û kesên neteweyî di nav enîyeke neteweyî û demokratîk da bêne kom kirin.”... Ev tesbîte teorîken û pratîken rastîyeke objektîv ya karektera şoreşa neteweyî îfade dike ku ji aliyê hemû terefan ve tete gotin. Heta vê derê hertişt rast tete îzah kirin. Belê gava dor hate pratîka vê teorîya rast, herkes û derûdor ji tîlên cuda lêdidin û rûyê xwe ji hevdu digirin û xwe bi aliyekî di ve badidin. Çu kes, çu alî girêdayî sozên xwe yê teorîk namînin û li naveroka programên xwe xwudan dernakevin. Her kes û her alî sûc û gunehê diavêjin ser terefê di. Dîroka polîtîka Kurdî bi vê paradoksê ve mişt û tijî ye. Di navbeyna wan da qayîşkêşîyeke bêbin û bêmana tete kirin û di encam da tişteki pozîtîv dernakeve meydanê. Ji ber ku çu organîzasyon li ser xwe objektîv nahizirin, li goreyî rewş û şiyana xwe bi rê nakevin, hebûna xwe ya pratîk objektîven analîz nakin. Di xebata polîtîk da hebûn û zelalîya teorîk û bîr û ramanî giring e û pêdivî ye. Belê temetî vê hewcehîyê xebata pratîk jî divêtin. Xwudanê teorî û programeke baş bûyîn têra hebûna rêxistinîbûnê nake û divêt pratîken jî hebûnî li ber çavan be.

Karûbarê pratîk bi xebateke xurt, aktîv, dînamîk û fedakarane pêktêt. Pratîka ku li ser bîr û raman û teorîya hatîye danan bejn bide, hingê di jîyana

polîtîk da ji hebûnîyê tete behs kirin. Cîhana polîtîk ji milekê ve herçend teorîk jî be, belê di çarçoveya giştî da pratîk e û konkret e. Karê polîtîk dozdarî ye û doza desthilatê dike û ji ber hindê jî organîzasyonên polîtîk bi plan û projeyên konkret derdikevin pêşîya xelkê. Xelk jî li goreyî şiyana, aktîvîte, dînamîzm û fedakarîya pratîk meyildarîya xwe nîşanî organîzasyonên polîtîk dide. Pratîk sehneya ceribandina programên teorîk yê rêxistinan e. Rêxistina ku di sehneya pratîk da digel teorîya xwe rast û durust be û vê lihevîya teorîk û pratîk nîşanî xelkê bide, dibe cazîbeya polîtîk û xelk li dor wê organîzasyonê kom dibe. Helbete gelek faktorên di yê rexî û talî û giranahîya konjonktûrê jî heye ku tesîrê li ser meyildarîya xelkê dike ku ber bi rêxistineke polîtîk ve biçin, belê di nav van hemû faktorên da ya sereke dînamîzma pratîk ya rêxistinê bi xwe ye. Rêxistina ku bi armanca azadîya xelkê bindest û rizgarkirina welatê dagîr derketîye pêşîya xelkê, mecbûr e ku di pratîka xwe da aktîv, dînamîk, fedakar û rîskwergir be ku bikare bawerîyê bide xelkê xwe û bi vê bawerîyê pêşengîya xelkê bike. Rêxistina ku xwe bi vê bîr û bawerîyê hûnandî û rapêçayî dikare hem xelkê organîze bike, hem jî hemû hêz û taqeta neteweyî di pratîkê da mobilîze bike. Pîva serkevtinê ev mezinahî û gihiştina vê dereceya organîzativ û şiyana di rê birina xelkê ye.

Di şoreşên çînayeyetî da bin, anjî di şoreşên neteweyî û demokratîk da bin, pîva sereke organîzekirin û mobilîzekirina xelkê ye. Li goreyî armanca û naverok û karektera her şoreşê helbet programên cuda, stratejî, taktîk û metodên cuda tene danan û realîze kirin, belê xala hevpişk tégihandin, organîzekirin û mobilîzekirina piranîya maqûl e. Organîzasyonên ku vî formûlî di partîkê da bi cih tînin, dikarin ji bo pêkînanana enîyeke berfireh rola pêşeng bileyizin. Li cîhanê çi şoreşên çînayetî bin, çi şoreşên neteweyî û demokratîk bin, bêyî tifaqeke pahn û berîn bi ser nakevin. Di pêşengîya bi tinê organîzasyonêke da jî be, esasen di pratîkê da piranîya maqûl ya civatê li dor armanceke hevpişk tete kom kirin û mobilîze kirin. Belê heke cîhana polîtîk ji gelek organîzasyonan pêkhatî be, hingê jî ew enîya fireh ji wan organîzasyonan pêktêt. Lê axir di her çi rewş û şertan da jî be, hewcehîya şoreşê, xwastekên xelkê, organîzasyonê motîve dikin ku wezîfeyên xwe yê komkerîyê bi cih binin. Di demên ku pêdivîya enîyeke fireh derdikeve da, du nêrîn û reftarên ekstrem dibine binasê pêknehatina enîya berfireh. Heke organîzasyon tûşî nisaxîya mezinahîyê bin, ”em têra xwe û hertiştî hene” bêjin, eve bi serê xwe dibe astenga herî mezin li pêşîya pêkînanana enîyekê.

Ya dî jî, heke organîzasyon xwudan însiyatîv nebin, pasîv û statîk bin, formûlasyonên teorîk bêjin belê pratîken xwe jî cihê xwe ne livînin, ev nêrîn û reftare jî dibe astengeke dijwar li pêşîya enîgirîyê. Di herdu nêrîn û reftaran da xala hevpişk xemsaî ye, çiku yêk xwe li ser ewra dibîne û di dereceya bi xwe bawerbûna negatîv da ye, nêrîna dî jî pîrbêj e lê bê pratîk e û bi xwe ne bawer e. Digel van faktorên sereke, faktorên dî yên giring jî, nebûna xweşbînî û tehemmula polîtîk e. Heke organîzasyonên polîtîk hem di nav xwe da, hem jî digel hev normên modern û demokratîk bi kar neînin, hebûnên xwe yên cuda qebûl nekin, li ser bingehê demokrasiyê di nav rekabeteke demokratîk da nebin, li wê derê aheng û lihevî naê dîtin. Heke em vê çarçoveya teorîk û abstark li nav civata Kurd konkretîze bikin, tabloyeke pozîtîv dernakeve meydane.

Em gelek dûr neçin, hema rewşa îro bidine ber çavê xwe. Li Kurdistanê Başûr piştî operasyona Amerîkayê ya li ser Iraqê ya qonaxa ewilî ya demê şerê Kuweytê, Amerîkayê û tifaqdarên Ewrûpî parçeyê başûr yê Kurdistanê hilgirtin bin ewlehîyê û piştevaniya xelkê Kurd kirin û îdareyeke xweser ya Kurdî hate durust kirin. Di vê rewşa pozîtîv da 19ê Gulana 1992ê hilibjartin pêkhatin û parlamentoyeke nû hate danan. Lê belê ji ber ku di nav organîzasyonên polîtîk da rekabeteke modern û demokratîk nebû, di nav wan şertên konjonktûrel da rêxistinên karî bes du sala bi hev ra bixebitin. Piştî du sala, li ser hevdu cunta kirin û xwastin ku yêk ya dî teswîye bike. Ji xwe paşê jî di Kurdistanê Başûr da du hukûmetên bajêrî pêkhatin; Silêmaniye û Hewlêr!.. Lê teorîken her rêxistinekê bi dengê bilind digot ku divêt hêzên neteweyî li ser armanc û berjewendiyên neteweyî tifaqê bikin. Belê pratîka wan ne tifaq, tam bereksî wê nifaq bû. Vê nifaqê gelek dem û îmkân bi wan dane berze kirin û tesîreke negatîv li ser bi giştî bizava neteweyî kir. Di qonaxa duyê da, li Nîsana 2003ê, Amerîkayê Seddam bir û dîzayna Iraqê nû hate dest pê kirin ku rola Kurda sereke bû. Digel Kurda hilweşandina rejîma Seddam bo xwe kiribûn ramanca sereke û ev dawxaza wan bi operasyona Amerîkayê ve pêkhat, lê dîsa ve tifaq di nav xwe da paş dan û axir bi paldan û fişara xelkê Kurd û esasen jî bi zora dînamîkên derve anku bi fişara Amerîkayê destên xwe dane hev û hem di bin parlemeenteke yêkgirtî da gihîştin hev, hem jî duserîya hukûmetî rakirin û hukûmeteke yêkgirtî ya neteweyî danan. Ev nimûneya li Kurdistanê Başûr jî bi serê xwe paradoksa organîzasyonên polîtîk yên Kurdî nîşandide. Heke digel program û armancên xwe durust ban, divîya bû ku bêyî fişara

dînamîkên derve, bêyî tesîra konjonktûrel li ser berjewendiyên neteweyî gihîştin hev û tifaqa navxweyî pêkînan. Lê mixabin ku ev nisaxîya tradîsyonel ya organîzasyonên polîtîk yên Kurda dom dike û tişteke dibêjin, belê berevajîyê gotina xwe dikin!. Ev qusûra cîhana organîze ya Kurd li hemû parçeyan kê zêde eynî tişt e û dubaretiya hevdu dikin. Anku organîzasyonên polîtîk goreyî fikira xwe zikir nakin!. Eve jî paradokseke kûr û kronîk e. Li Kurdistanê Rojhilat jî, du sê rêxistinên polîtîk yên nasyar hene, belê di navbeyna wan da, tifaqê danin alîyekê, diyalog jî nîne. Li Kurdistanê Başûrarojava jî qedereke rêxistinên polîtîk hene û di navbeyna wan da jî têkilî û tifaqêke rêkûpêk û stabîl nîne. Kurdistanê Bakur jî kê parçeyên dî nîne û hetta hêj xirabtir e.

Li Kurdistanê Bakur yê ku tene zanî pence şeş organîzasyonên polîtîk hene û di navbeyna wan da têkilî û tifaqêke ku bi rastî li goreyî programa bizava neteweyî û demokratîk be, nîne. Carna yêk du organîzasyon ji ber şertên taybetî yên navxweyî tifaqên konjonktûrel dadînin lê di sethê polîtîk da tesîreke nakin. Cudahîya Kurdistanê Bakur ji parçeyên rojhilat û başûrarojava ew e ku hem parçeyê mezin e û nîfûseke boş heye, hem jî rêxistineke bi xurtî organîze heye. Ev organîzebûn hem di warê polîtîk, hem jî di warê leşkerî da tete dîtin û eve avantajeke mezin dide bizava neteweyî li bakur. Organîzebûna li bakur, adeta nêzikî pîranîya baskên xelkî, çîn, grûb û kategoriyên ji hev cuda yên civatê, di bin per û baskên xwe da organîze kirîye û hêzeke mezin ya neteweyî derêxistîye meydana pratîk ya polîtîka Kurdistanê. Organîzebûna li bakur, hûr gir, elementên neteweyî kê zêde komî serhev kirine û evê li goreyî karaktere şoreşa neteweyî û demokratîk rengêkî pozîtîv derêxistîye meydane. Belê digel ku organîzebûna li bakur di nav enîyeke bi modelê yêk rêxistinî ya neteweyî û demokratîk da bi hejmareke boş pêkhatibe jî, eve naete wê manayê ku tifaqa maqûl pêkhatîye. Ew tifaqa ku şoreşa neteweyî û demokratîk li bakur hewcehî pê heyî hêj di çarçoveya ku tete xwastin da nîne û divêt ber bi avakirina tifaqa maqûl li bakur gavên hewce bene avêtin. Gerçî di vî warî da hewil û hingav hene û lêgerîneke hêvîdar jî heye, belê axir divêt hemleya pêkînan tifaqa maqûl bête domandin. Yêk bi yêk li parçeyên Kurdistanê û komple Kurdistanê da, kê zêde panoramaya polîtîk û rêxistinî ya di warê organîzebûnê da ev e. Bi kurtî belavî û ji hev dûrîyek heye û eve jî ji kêmasîyê wêdatir, wekî qusûreke micid li ber çavan e. Ji bilî belavîya parçeyî, herweha di navbeyna parçeyên Kurdistanê da jî ev qusûr dom dike û hetta kûrtir

jî. Bi çu awayî di nav organîzasyonên polîtîk yê parçeyên Kurdistanê da têkilîyeke ku xelkê Kurd pê şa û bexetwar be naête dîtin. Di navbeyna wan da rekabeteke modern û demokratîk jî nîne, belê rekabeta ku hevdu ji meydana polîtîk teswîye bikin heye!. Kes mevcûdîyeta yê dî anjî ya dî qebûl nake, anjî tehemmulê nîşan nade. Li berahîka hevdu asteng derêxistin, taqoz danan û bi hevdu ra şerê dîka kirin adeta wekî metodekî rekabetê tete bi kar înan. Ev negatîvîya heyî jî, bivê nevē tesîreke xirabker dike di danana têkilî anjî diyalogê da û tehrîbateke kûr pêktîne. Heke bi çavekî objektîv li rewşa polîtîk bete nêrîn dê gelek ron û zelal bête dîtin ku di navbeyna yek bi yek organîzasyonên Kurd da, di navbeyna parçeyên Kurdistanê da, di navbeyna organîzasyonên parçeyên cuda da têkilîyeke ku bêhna layiqen neteweyî jê bêt nîne mixabin. Di tabloya tete dîtin da çu rengên diyalogê naêne dîtin. Eve bi serê xwe negatîvîyek e û dîsa ve paradoksa organîzasyonên polîtîk ya di warê programatîk û pratîk da nîşan dide.

Hebûna KNKYê

Di nav hinde şertên dijwar û hetta negatîv da, di nav vê berbelavî û nebûna têkilî û diyalogê da, wekî organîzasyonê heterojen û sihwaneyî, hebûna KNKYê dîsa ve şansek e. Ji programa KNKYê kîvş dibe ku ew wekî organîzasyonê sihwaneyî ji hewcehîya neteweyî peyda bûye. Esasen, bi kîjan reng û modelî be ferq nake, rêxistin di prosesa bizavên neteweyî da ji bo armanca bi dest êxistina bi giştî maf û azadîyan ya bi rola organîzativ û administrativ ve aletên giring û pêdivî ne. Hindî reng û rûyên organîzasyonan e, wê jî şert û hewcehî kîvş dikin. Carna şert hewce dikin ku organîzasyonên polîtîk bi program û endamgirîyê ve relatîven homojen in. Lê carna jî rewş û şert, organîzasyonên dîsa ve relatîven heterojen derdêxine meydanê. Vêca rêxistinên wekî KNKYê hem heterojen û hem jî sihwaneyî, li goreyî naverok û karektera şoreşên neteweyî û demokratîk bi piranî modelên îdeal in û hewcehîyeke jîyanî bi van tarz rêxistinan dibe. Xuya ye ku KNK ji ber van hewcehîyan û bi nîyeteke rast û paqij pêkhatîye. Ev tarz rêxistin di şoreşên hevde yê şoreşa Kurdistanê da hatine dîtin, lewma ji bo bizava neteweyî ya xelkê Kurdistanê jî ne xerîb e û li karektera şoreşa Kurdistanê têt. Belê, divêt aşkera bête gotin ku KNK ji serî were bi kêmasîyeke navxweyî dest bi kar bû û mixabin ku ew kêmasî hêj jî dom dike û ji halê ranebûye.

Çi ye ew kêmasî?

Di normalîyê da KNK wekî organîzasyonê

sihwaneyî, parçeyek be an ji hemû parçeyan bin, divêt hemû anjî hejmareke maqûl ya rêxistin û kesên welatperwer û neteweperwer di bin per û baskên xwe da komî serhev bike. Eve her di serî da jî pêknehat. Pêşengîya damezrandina KNKYê PKKyê kir û ji ber vê yêkê jî her di serî da KNK ji PKK û tardsiyona wê û çî sosyopolîtîk bin, çî sosyokulturel bin û çî jî sosyoekonomîk bin ji rêxistinên nêzikî xeta PKKyê pêkhat. Eve ne qusûrek e helbet. Çiku heke bi cografîya û nîfûsê ve parçeyê Kurdistanê yê bakur li ber çavan bête wergirtin, ku PKK rêxistina herî mezin û organîze ya li bakur e, rol û pozîsyona PKKyê kîvş dibe. Di danana rêxistineke heterojen ya neteweyî da, di rêxistineke sihwaneyî da, pêşengî û hebûna rêxistina herî mezin bi serê xwe avantajê gelek giring e. Lê ji ber ku dizayn nexşeyê polîtîk li Kurdistanê tabloyê belav û dûrî hev nîşan dide û beramberî PKKyê jî negatîvîyeke bê mana îfade dike, KNK tinê bi hebûna PKK û alyansa PKKyê ve teng dimîne. Ji parçeyê rojhilat, ji parçeyê başûr û ji parçeyê başûrarojava, organîzasyonên ku ji xeta PKK û tradîsyona wê dûr cih nagirin. Eve realîteyek e ku ew organîzasyon xwe ji KNKYê dûr digirin. Belê ya rastî hemûyan jî çu argumentên têrker nînin ku boçî di nav KNKYê da cih nagirin. Ew hemû pêkve jî nikarin ne xwe, ne çu alîyan, ne jî piranîya xelkê qani bikin ku ew boçî ne di nav KNKYê da ne!. Heke tete hizirîn ku KNK di bin domînantîya PKK û alyansa wê da ye, hingê bi normalî û herweha polîtîken divêt ew jî bête di nav refên neteweyî da cihê xwe bigirin û zemîne rêxistina neteweyî zengîntir û heterojentir bikin û herweha relatîven jî be pirdengîyê hakim bikin.

Divêt objektîven bête gotin ku PKK dixwaze û pratîken jî hewilan dide ku zemîne KNKYê firehtir be û hêz û kesên welatperwer û neteweperwer bêne nav KNKYê. Lê rêxistinên dî bêtî argumentên maqûl û têrker xwe nezîkî KNKYê nakin û bi vê reftara xwe ya pratîk ve jî di nav paradoksa xwe da patînajê dikin ku ew reftara wan xizmeta berjewendîyên neteweyî jî nake. Şik teta nîne ku di danana têkilî û diyalogê da, di pêkînan zemînen hevrayî û enîgirî da qusûr û kêmasîyên PKKyê jî hene, hebûne û hêj jî tene dîtin. Helbete PKKyê jî xwe ji negatîvîya qudrettelebîyê xilas nekirîye û di pratîka xwe da vê hêzperesîya xwe didomîne jî. Eve rûyekî madalyonê ye û rastîyek e û bêşik negatîv e.

Belê divêt li rûyê dî yê madalyonê jî bête nêrîn. Di rûyê dî yê madalyonê da jî pozîtîvîya PKKyê heye û digel hemû kêma û kasîyên xwe, zeafên domînantîya xwe, dîsa ve hem bang û gazîyên xwe dike, hem jî di

pratîkê da hemû îmkânên xwe seferber dike ku hêz û enerjîya neteweyî di nav refên KNKYê da kom be. Divêt eve bi objektîvî bête dîtin û relatîven jî be ev reftare bi pozîtîvî bête biha kirin û qîmet bête dayîn. Alyans û tifaq bêyî tawîzan pêknaên. Çu rêxistin di çeperên xwe yê bilind da nikarin bêne nik hev. Divêt hemû rêxistin û kesên welatperwer û neteweperwer ji bo berjewendiyên neteweyî û armanca rizgarîya neteweyî û demokratîk xwastekên xwe beramberî hev kêmbikin û pratîken jî beramberî hev gavan paşve biavêjin, anjî bi gotina tahl û antîpatîk, tawîza bidine hev ku di zemînê neteweyî da bigihin hev. Jîyana kolektîv bêyî tevazû û tawiz pêknaêt. Kolektîvîte vê xweşbînîya beramberî hev mecbûrî dike. Lewma organîzasyonên neteweyî li ser asasê berjewendiyên neteweyî mecbûrî hev in û ji xwe heke digel armancên xwe yê programatîk û polîtîk jî rast û durust bin, divêt di xeta tifaqa neteweyî da bigihin hev û yêkitîya neteweyî pêkbînin. Reftara berevajîyê vê rastîyê, esasen hem ji aliyê programatîk û teorîk ve, hem jî ji aliyê pratîk û hebûna xwe ya organîzativ ve, xwe red û inkar kirine. Çu armanc, plan û projeyên kesîni û rexistinî, ji berjewendiyên neteweyî mezintir û bihadartir nînin.

Organîzasyonên sosyopolîtîk, yê sosyokultürel, yê sosyoekonomîk û kesayetiyên welatperwer û neteweperwer, di çarçoveya heterojen ya neteweyî ya kolektîv da, mecbûr in ku bêne nik hev û hêz, şîyan û enerjîya xwe bi hev ra ji bo armanca pîroz ya şoreşa neteweyî û demokratîk mobilize bikin. Gotin û reftarên dûrî vê rastîyê, bi gotina herî sade û sivik ne maqûl in. Ji ber hindê divêt rewş û şertên şoreşa bi giştî ya neteweyî û demokratîk ya xelkê Kurd û Kurdistanê, pozisyona dewletên kolonyalist û dagîrker bi çavekî objektîv bête dîtin, prosesa ku tête jîyan bi baldarî bête analiz kirin û biha kirin û goreyî vê yêkê pozîsyon bête wergirtin, reftara pratîk bête kivş kirin. Şoreşa neteweyî û demokratîk ya xelkê Kurd û Kurdistanê di van şertên heyî da, di vê prosesa tête jîyan da, di vê hercûmerca tête dîtin da, di nav ablûkaya hêz û dewletên kolonyalist û dagîrker da ye û ev hêz û dewletên kolonyalist û dagîrker, car yêk bi yêk, carna jî bi hev ra û bi koordine dizxwazin bêhnê li xelkê me çik bikin û bizava neteweyî pêkve bifetîsin û berxwedan û serhildana neteweyî û demokratîk teswîye bikin. Piştî ku parçeyê başûr azad bû û di nav Iraqa nû da rengekî federatîf wergirt û relatîven jî be kolonyalizm hate teswîye kirin û hukûmeteke yêkgirtî û neteweyî hate danan û vê hebûna federal hem di nav Iraqa nû da, hem jî di meydana polîtîk ya navneteweyî da fermiyet wergirt, dewletên di yê kolonyalist û dagîrker yê

wekî Iran, Sûriye û Tirkîyeyê, koordineasyona xwe ya antî Kurd xurttir kirin û êrişkarîyên xwe zêdetir kirin. Di vê konseptê nû da serê xirabkerî û antî Kurdîtiyê û patronî û mutehîdîya vê alyansa bêyûm dîsa ve Tirkîye dike û Iran û Sûriyeyê jî carna wekî taşeron aktîve dike beramberî bizava neteweyî.

Gerçî İran û Sûriye jî yêk bi yêk jî be bi serê xwe dijî xelkê Kurd êrişkarîyê dikin, belê piştî pêkhatina dewleta federal ya Kurdistanê Başûr, êrişkarîya hersê dewletan rengekî nû wergirtîye û êdî bi koordine vê êrişkarîya xwe didomînin. Lewma ablûkaya li dora bizava bi giştî neteweyî û demokratîk ya xelkê Kurd û Kurdistanê di şertên heyî da, di konjonktûra îro da, di dereceya herî bilind da ye. Ji xwe piştî ku Amerika û tifaqdarên xwe Iraqa nû dizayn kirin û bi taybetî Amerîkayê projeya xwe ya demokratîzekirina rojhilatanavîn bi Iraqa nû gaweke pêşve bir, agir kete pêşîra Tirkîye, İran û Sûriyeyê. Ji ber ku wekî di nimûneya Iraqa nû da jî hate dîtin ku dinamîka herî saxlem û stabîl ya demokratîzasyonê rojhilatanavîn hêza xelkê Kurd e. Xwudanên projeya demokratîzasyonê jî baş dizanin ku hisaba wan tinê bi tifaqa digel Kurdan dikare biçê serî. Ev realîteya nû ya navçeya rojhilatanavîn bivê nevē xew û xewnên Tirkîye, İran û Sûriyeyê direvîne.

Projeya demokratîzasyonê rojhilatanavîn statûkoya heta îro di cografîyaya Iraqê da hilweşand û ji wî kavilê statûkoya Iraqa Seddam, Iraqeke nû derket û di vê tabloya nû da jî parçeyekî Kurdistanê azad bû. Vêca serê davê veresîya li navçeya rojhilatanavîn. Îro parçeyê başûr azad bû, subehî parçeyê rojhilat û paşê jî yê dî. Di şert û konjonktûra îro da İran li ber tîrên Amerîkayê ye û eve keysekî nû û nedîtî yê pozîtîf derdêxe pêşîya bizava neteweyî û demokratîk ya xelkê Kurd li parçeyê rojhilat. Êdî statûko ji milekê ve xirab bûye û rawestandina vê têkçûnê ne mumkun e.

Îran wekî rejim di nîveka polîgona agirê Amerika û tifaqdarên wê da ye. Piştî Iraqê xelesa zêf nihe Iran e û eve jî tête wê manayê ku parçeyê rojhilat yê Kurdistanê nêzîktirî azadîyê ye. Belê helbet têkoşîna parçeyên di jî bi xurtî dom dike. Bi taybetî Tirkîye wekî xwudan û dizaynera enîya bêyûm ya antî Kurdîtiyê, hem di nav tixûbên xwe yê fermî da, hem jî li rex û dorên xwe yê Kurdcihîn, êrişkarîyeke nedîtî dike û teroreke bêtixûb pêktîne li ser bizava bi giştî neteweyî ya xelkê Kurd. Tirkîye bi vê terora navxweyî namîne, dijî rojhilat û başûr jî operasyonên terorî pêktîne. Sûriye jî kêmbî İran û Tirkîyeyê namîne û bi bayê teroreke ecêb diwar bêhna xelkê Kurd adeta çik dike. Vêca panoramaya

Kurdistanê kême zêde ev e û gelek aşkera ev tablo û panorama, werarên xêrê nîşan nade. Êrişkarî û ablûkakerina dewletên kolonyalîst û dagîrker di dereceya bêhnçikkirinê da ye. Di van şertan da, di vê konjonktûra îro da, ku di nav xwe da keysên pozîtîv jî disitirîne, rêya maqûl ew e ku hêzên neteweyî jî li ser esasê berjewendîyên neteweyî, destê xwe bidin hev, hêz, şîyan û enerjîya xwe di potaya neteweyî da komî serhev bikin û di çarçoveya herî fireh da û her bi çi reng û metodî be, tifaqa neteweyî pêkbinin. Ji bo tifaqa neteweyî formên rêxistinî gelek in û divêt di yêk reng û formî da asêti neête kirin. Rêxistin alet in, ne armanc in, lewma jî nav û form baqî nînin, li goreyî hewcehîya neteweyî dikarin bêne guhorîn. Nav û formên rêxistina ne ayetên dînî ne, ne dogma, ne jî tabû ne ku neêne guhorîn.

Lê belê, di şettên îro da ji bo hemû hêz û kesên neteweyî, ji bo komkirina hêz, şîyan û enerjîya neteweyî ya kolektîv, zemînek hatîye pêkînan û wekî rêxistineke heterojen û sihwaneyî KNK hatîye danan û eve jî destkevtok e. Ev zemîn dikare bête xurt kirin û bi kar înan. KNK ne ji alîyê programatîk ve, ne jî alîyê pratîk û terkîba endametîyê ve ne kamil e, belê hebûnek e. Bi kême û kasî, bi qusûr û zeafên xwe ve rêxistineke e ku bi nîyet û armanca komkirina hêzên neteweyî hatîye damezrandin û îro fonksiyonel e. Di rê da ye, di cih da ye û herweha gelek maqûl e ku bête teqwîye kirin, bête xurt kirin, bête zengîntir kirin. Rast e ku hestîyê piştê yê îskeletê KNKyê ji PKK, tradisyona wê û dostên PKKyê pêkhatîye û eve jî hebûn û pêkhatineke neteweyî ye û helbet jî pozîtîv e. Dîsa ve rast e ku ne bes e, têra nake û divêt terkîba KNKyê ji alîyê pîrrengî û pîrdengîya polîtîk û bîr û ramanî ve bête zêde û xurt kirin. Halîhazir digel ku hêza domînant PKK û alyansa wê ye û herweha kesayetîyên serbixwe yê welatperwer û neteweperwer jî têda ne, belê ev terkîbe têra nake, ne bes e û eve ji teref PKKyê ve jî tête qebûl kirin. Organîzasyonên di yê Kurd û Kurdistanî, kesên welatperwer û neteweperwer divêt berjewendîyên neteweyî di serê her tiştî da bigirin û desta ji tengbînîya heta îro berdî, gazî û banga ku di bin banê KNKyê da kombûnê bêyî bersiv nehêlin. KNK bi hebûna xwe ve çeperekî saxlem yê bizava neteweyî û demokratîk ya xelkê Kurd û Kurdistanê ye. Dijî enîya bêyûm û minafîq ya dewletên kolonyalîst û dagîrker yê wekî Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê, enîya pîroz ya hemû hêz û kesên neteweyî yê Kurdistanê disa ve KNK ye û divêt ev çeperê neteweyî bête xurt û saxlem kirin. Misyonê KNKyê pêkînana tifaqa herî fireh ya neteweyî ye. KNK bi bang û gazîya pêkînan tifaqa neteweyî ji dil

e û di nav çu hesabên biçûk yê polîtîk û rêxistinî da nîne. KNK li muştereka asgarî ya neteweyî digere. Di şertên heyî da, di konjonktûra îro da ev muştereka asgarî, dijî kolonyalîzm û dagîrîyê û enîya wan dewletên dijmin, pêkînana tifaqa herî fireh ya neteweyî ye. KNK di gava lezîn da jî qet nebe li têkilî û diyaloga neteweyî digere û dixwaze di gava pêşîn da dîsa ve qet nebe koordînasyoneke neteweyî pêkête ku eve jî dê bibe gaveke saxlem ji bo avakirina hevgerîneke pahn û berîntir ya neteweyî. KNK ne qadirî mutleq e, ne dogma, ne jî tabû ye û herweha ne mekanîzmayeke mekanîk û statîk e ku guhorîn an jî nûvebûn lê neête kirin. KNK di nav prosesa firehbûna tifaqa neteweyî da dikare her reng û formekî nû werbigire. Ya rast û giring ew e ku terkîb bête firehtir û zengîntir kirin. Gavên di dikarin di nav sîstemê demokratîk yê navxweyî da çareser bibin û KNK ji bo vê yêkê vekirî ye. Tête hêvî kirin ku ev daxwaz û xwezî û hêvîya KNKyê şaş neête mana û tercume kirin. KNKyê per û baskên xwe, der û pencereyên xwe ji bo hemû elementên neteweyî heta dawîyê vekirine. Kombûna giştî ya 6. ya KNKyê, [13 – 14 Gulan 2006, Bruksel], eve bo xwe kirîye parola û ji ber vê yêkê jî hem ji alîyê programatîk ve, hem jî ji alîyê mekanîzma û sîstemî ve reformasyoneke pêdivî û pêşve pêkînaye. Bi hêvîya ku bîr û bawerî û nêrîn û reftara ku bo xwe tifaqa neteweyî kirîye armanc, serbikeve.

Gulan 2006

**„... Organîzasyonên
sosyopolîtîk, yê sosyokulturel,
yê sosyoekonomîk û
kesayetîyên welatperwer û
neteweperwer, di çarçoveya
heterojen ya neteweyî ya
kolektîv da,
mecbûr in ku bêne nik hev û
hêz, şîyan û enerjîya xwe bi hev
ra ji bo armanca pîroz ya şoreşa
neteweyî û demokratîk mobîlize
bikin. Gotin û reftarên dûrî vê
rastîyê, bi gotina herî sade û
sivik ne maqûl in...“**

**Piştî kombûna konseya rêvebir ya
KNKyê ev daxuyanîya li jêr hate**

belav kirin:

**Konseya Rêvebir ya
KNKyê kombû**

Wekî tete zanîn KKNKyê kombûna xwe ya giştî ya 6. di 13-14ê Gulanê da pêkîna. Taybetîya xweser ya vê kombûna giştî ew bû ku bi yêkdengî biryara reorganîzasyona KKNKyê hate dan û di program, sîstem û mekanîzmaya KKNKyê da reformeke giring hate kirin. KKNKyê bi vê biryara xwe ya nûvekirinê, di warê pêkînana yêkitîya neteweyî da gaveke pêşve avêt û armanc û perspektîva xwe ya nû bi plan û projeyên rasyonel konkret û zelal kir.

Li goreyî van biryarên nû Konseya Rêvebir kombûna xwe ya pêşîn di 2ê Hezîranê da kir. Di vê kombûnê da Konseya Rêvebir li ser rojeveke têrker karê xwe bi dawî îna û biryarên li ser karûbarên peryoda pêşîn wergirtin û planê xebata organîzativ û pratîk digel berpirsiyar û endamên komisyonên kar û xebatê hatin kivş kirin.

Di kombûnê da armancên KKNKyê yê demê nêzîk, demê navin û demê dûr hatin tesbît kirin. Di çarçoveya plandanerîya demê nû da, biryarên ku di kombûna giştî da hatibûn wergirtin, li goreyî lezînyetê hatin tesnîf kirin. KKNKyê yêkitîya neteweyî û demokratîk ya hemû element û dînamîkên neteweyî ya di bin sihwaneya xwe da wekî armanca sereke destnîşan kir û rastîya vê armanca ku temsîla hissîyata neteweyî dike teyîd kir û biryara domandina xebata ji bo vê armanca pîroz dubare kir. Belê Konseya Rêvebir digel vê tesbîta rast, herweha dem û şertên îro jî bi çavekî rasyonel analîz kir û gihişte wê bawerîyê ku di gava pêşîn da û lezînen ji bo pêkînana têkilî, diyalog û koordînasyona hemû element û dînamîkên neteweyî kar û xebatê bête kirin.

Konseya Rêvebir ji bo realîzekirina armancên programatik ev biryarên konkret wergirtin:

1. Li goreyî dem û şert û konjonktûra nû amadekirina perspektîva polîtîka neteweyî
2. Pêkînana têkilîyên bi giştî yê di meydana neteweyî û navneteweyî da
3. Organîzekirina konferansên li ser doza

Kurd û Kurdistanê di warê neteweyî û navneteweyî da

4. Destpêkirin û koordînekirina hemleya kar û xebatên li ser ziman û perwerdeya Kurdî
5. Xebata ji bo amadekirina konferansa jinên Kurd û têkilîyên digel organîzasyonên hevçeper yê jinan di çarçoveya navneteweyî da
6. Pêkînana karûbarên çapemenî û weşangerîyê

Konseya Rêvebir di encam da dubare bang li hemû dînamîkên neteweyî kir ku di ware pêkînana yêkitîya neteweyî da her kes û her alî rol û berpirsiyarîyên xwe bînin cih û mil bidine vê xebata neteweyî ya KKNKyê.

Konseya Rêvebir ya KKNKyê

2 Hezîran 2006, Bruksel

**«... Taybetîya xweser ya
vê kombûna giştî ew bû
ku bi yêkdengî biryara
reorganîzasyona KKNKyê
hate dan û di program,
sîstem û mekanîzmaya
KKNKyê da reformeke giring
hate kirin. KKNKyê bi vê
biryara xwe ya nûvekirinê,
di warê pêkînana yêkitîya
neteweyî da gaveke
pêşve avêt û armanc û
perspektîva xwe ya nû bi
plan û projeyên rasyonel
konkret û zelal kir... »**

”Komisyona ziman û perwerdeyê” ya KNKyê li 8ê Tîrmeha 2006ê, roja şembîyê, li merkeza KKNKyê kombû û ev daxuyanîya li jêr belav kir

Rojeva komisyonê bi pirs û pirsgirêkên zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî ve tijî bû. Di kombûnê da pirs û pirsgirêkên ziman û perwerdeyê bi giştî, ji aliyê teorîk û pratîk ve hatin riberiz kirin, li ser astengî û çareserîyê hate rawestan û encamên giring hatin derêxistin.

Li goreyî vê yêkê, di kombûnê da hate kivş kirin ku zimanê Kurdî li Kurdistana Bakur û li hemû meydanên dîasporayê di warê pratîkê da, di dereceya tehlîkeyê da kêmtê axivtin û di warên têkilî, danûstandin, nivîskarî û weşangerîyê da jî kêmtê bi kar înan. Di kombûnê da herwisa hate tesbît kirin ku digel vê qusûr û kêmasîya neaxivtina zimanî, nebûna perwerdeya Kurdî jî vê kêmasîyê kûrtir û girantir dike. Li ber vê rastîya objektîv komisyonê biryarên konkret wergirtin û ji bo bi kar înana van biryaran jî bo hemû dem û dezgehên neteweyî tewsiyeyên pratîk kirin.

Digel biryar û tewsiyeyan, herweha bi sernivîsa **”Hawara KKNKyê”** jî bangêk hate dan ku xelkê Kurd bi taybetî li Kurdistana Bakur û dîasporayê beramberî zimanê xwe bi berpirsiyarî rabin.

Biryarên hatine wergirtin

Komisyona ziman û perwerdeyê, digel hazirîyên xwe yên teorîk û pratîk, hemû kar û xebatên

organîzasyonên polîtîk, sosyal, kulturî û hunerî yên ku endamên KKNKyê ne, dane ber çav û li goreyî şert û hewcehîyên îro gihişte wê bawerîyê ku zimanê Kurdî li Kurdistana Bakur û li meydanên dîasporayê di nav tehlîkeyê da ye. Tehlîke ji du alîyan ve hate dîtîn û destnîşan kirin:

- I. Êrişkarîya dewleta Tirkîyeyê û asîmîlasyon.
- II. Xemsarîya Kurda bi xwe û otoasîmîlasyon.

Ji bo balkêşana ser vê pirsê û rê li ber girtina prosesa asîmîlasyona dewleta Tirkîyeyê û xemsarî û bêberpirsiyarîya Kurda bi xwe, biryarên giring ji bo demê nêzîk, demê navîn û demê dûr hatin wergirtin û ji bo realîzekirina wan biryaran jî hindêk aktîvîte lezînen hatin tesbît kirin ku di destpêka vê sezona payîzê da bi rengekî dînamîk bêne kirin.

1. **14yê Gulanê** wekî **”Cejna Zimanê Kurdî”** hate qebûl kirin û ji sala 2007ê pêve dê li timamî Kurdistanê û dîasporayê bi rengekî neteweyî bête pîroz kirin û wekî tradîsyon bête domandin.

2. Ji bo bi kar înan û herweha fermîkirina zimanê Kurdî, **”Kampanyaya zimanê Kurdî”**, berî sezona perwerdeyê û vebûna dibistanan, bi ragihandineke çapemenîyê, di 8ê Îlona 2006ê da, dê bête dest pê kirin.

Kampanya dê bi serslogana **”Ziman stûna ragir ya neteweyî ye”** dest pê bike û digel van sloganên li jêr, li her cih û warî dê li goreyî şertan sloganên di jî bêne tesbît kirin û bi kar înan.

- „Stop bo asîmîlasyon û otoasîmîlasyonê”
- ”Makzimanê min Kurdî ye”
- ”Kurdî sîyaneta Kurdîtiyê ye”
- ”Perwerdeya bi makzimanî çîmentoya hebûna neteweyî ye”

- ”Kurdîtîya xwe bi Kurdî bijî”

Di çarçoveya vê kampanyayê da, li Kurdistana Bakur û li dîasporayê, bi armanca fermîkirina zimanê Kurdî di nav sistemê perwerdeyê da, li goreyê şert û îmkanan aktîvîte dê bêne kirin û xwastekên di vî warî da dê bi her reng çalakîyan bêne îfade kirin û dijî qedexetîya dewleta Tirkîyeyê dê nerazîbûnên xurt bi rengê demokratîk û aştîyane bêne nîşandan.

3. Konferansa li ser pirs û pirsgirêkên zimanî, bi taybetî li ser gramerê, dê di nav salekê da bête kom kirin.

4. Li ser rewşa zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî, dê sempozyûmeke polîtîk+ akademîk, di navbeyna şeş mehan da û di çarçoveya Yêkitîya Ewrûpa û namzetîya endametîya Tirkîyeyê da bête organîze kirin û reftar û pozisyona xelkê Kurd bi aşkerayî hem ji bo Yêkitîya Ewrûpayê, hem jî bo dewleta Tirkîyeyê bête ron û zelal kirin.

5. Komîsyon dê li ser rewşa ziman û perwerdeyê li Kurdistanê û dîasporayê raporekê amade bike.

6. Medyaya Kurdî pêkve divêt cih bide kar û xebat û aktîvîteyên li ser zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî.

7. Digel nûnêrên dem û dezgehên neteweyî, 12ê Tebaxa 2006ê li bajêrê Elmanya, Kölnê, dê kombûneke dorfireh bête kirin û li ser bi giştî zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî bête rawestan û li îmkânên pêkve xebatkirinê bête geryan.

8. Li ser zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî, li cih û welatên hewce, di komele û înstîtusyonan da, dê semîner bêne dan.

9. Bultena Zimanê Kurdî dê bête weşandin.

10. Arşîva dokument û materyalên li ser zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî dê bête girtin.

11. Biryar û dokument ji endamên KNKYê ra dê bêne şandin û bîr û rehîya navxweyî û ya deryeyî ji hemû karûbar û kiryarên li ser zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî yê KNKYê bête agahdar kirin.

Komîsyona ziman û perwerdeyê ya KNKYê

08 Tîrmeh 2006, Bruksel

**“... 14yê Gulanê wekî
”Cejna Zimanê Kurdî”
hate qebûl kirin û ji sala
2007ê pêve dê li timamî
Kurdistanê û dîasporayê bi
rengê neteweyî bête pîroz
kirin û wekî tradîsyon bête
domandin...”**

Hawara KNKYê

Komîsyona ziman û perwerdeyê

bangek bi navê ”Hawara KNKYe”

ji bo bîr û rehîya Kurdistanê belav

kir ku balê bikêşe ser rewşa ziman û

berpirsiyarîya neteweyî. Bang li jêr e:

Bizava antî kolonyalîst ya xelkê Kurd, ji gelek alîyan ve cudatîrî bizavên antî kolonyalîst yê cihanê ye. Xelkên dî gava dijî rejimên kolonyalîst têkoşîn didan, hemû karûbarên xwe yê sosyopolîtîk, sosyokultûrel bi zimanê xwe dikirin. Herçend fişar û qedexeyên li ser ziman heban jî, desthilatên kolonyalîst zêdetir li ser naverok, mana û armancê radiwestan.

Kolonyalîstan bi rengê totalîst zimanên kolonîyên xwe yêkser qedexe nedikirin. Lê belê, eve li Kurdistanê kolonîya Tirkîyeyê çu cara wisa nebû. Tirkîyeyê tradîsyona împaratorîya Osmanîyan jî serûbin kir, ku ne navê Kurd, ne navê Kurdistanê, ne jî zimanê Kurdî di demê Osmanîyan da qedexe nebû. Belê dewleta nû ya Tirkîyeyê her ji despêkê pêve mengenyê fetisandinê li ser stûyê xelkê Kurd şidand û yêkser zimanê Kurdî bi reng û rûyên trajîkomîk qedexe kir. Dem hat bi qanûn, bi zora leşker û polîsî, dem hat bi ”quruş”an zimanê xelkê Kurd li xelkê Kurd qedexe kir û nehêla ku xelk bi rehetî bi zimanê xwe biaxive. Beramberî vê zulmê, axivtina zimanê Kurdî ji bo her Kurdekê adeta bû armanca herî mezin ya polîtîk û ji ber axivtina Kurdî bedelên mezin hatin dan, cizayên giran hatin wergirtin, hefs û zîndan hatin dîtin. Dewleta Tirkîyeyê ji serî were mekanîzmaya antî demokratîk, asîmilasyon bi kar îna ku zimanê Kurdî bide ji bîr kirin, di nav dem û salan da bide helandin û birandin. Ji bo vê armanca xwe ya kirêt çu kar û kiryarên ne mirovî hene hemû bi kar înan.

Dewleta Tirkîyeyê ji aliyê cografî ve navên cih û war, mezra, gund, navçe û bajêrên Kurdistanê guhorîn û li şûna wan navên Tirkî danan. Bi salan nehêlan ku xelk navên xwerû Kurdî dayne ser zarokên xwe. Bi kurtî dewleta Tirkîyeyê bi qedexeya zimanê Kurdî, jîyana xelkê Kurd kire jahr û mirin. Ev polîtîka kirêt, antî demokratîk û dijî mirovî hêj jî bi îsrar tete domandin.

Guhorînên van salên dawîyê yên li nav prosesa namzetîya endametîya Yêkitîya Ewrûpayê hatine kirin jî di pratîkê da bi sedan asteng û dijwarîyan adeta têne betal kirin. Eve rûyekî madalyonê ye û xelkê Kurd dijî vê asîmîlasyona kujer ya dewleta Tirkîyeyê têkoşîna xwe didomîne.

Belê li rûyê dî yê madalyonê jî reftara negatîv ya Kurd bi xwe heye ku ew jî xwe bi xwe asîmîle kirine, anku otoasîmîlasyon e. Îro Kurd hem li meydanên diasporayê, hem jî li welat bi zêdehî ve Tirkî diaxivin, karûbarên xwe, xebatên xwe yên polîtîk, kulturel, hunerî û sosyal bi Tirkî dikin, di têkilîyên xwe da Tirkî bi kar tînin. Dewleta Tirkîyeyê gelek bi zanahî Kurdî axivtin kirîye nîşana "nezanîyê", "cehaletê", "gundîtîye" û "paşvemayîne" û bi vê polîtîka xwe Kurdî axivtin kirîye statûyeke kêmtîyê. Beramberî vê yêkê, Tirkî axivtin wekî nîşana modernîyê, bajêrtîyê, zanatîyê, pêşveçûyîyê lanse kirîye û di vê polîtîka xwe da heta dereceyê jî serkevîye. Ev "standarta dewleta Tirkîyeyê" di pratîkê da adeta qebûlîyek jî peyda kirîye û heçku gava Kurdî têtê axivtin, "halefî rûhîye" yeke "xwe nizim dîtîne" têtê nîşandan. Hal ew e ku, eve bi gotina herî sade û sivik, xwe şkandine, xwe red û inkar kirine. Bi zanahî nebe jî ev reftare, xizmeta polîtîka asîmîlasyonîst ya dewleta Tirkîyeyê dike û gelek aşkera eve tehlîkeyeke mezin e ku dê bi xwe ra jar û lawazî û feqîrîya zimanî bîne ku eve jî rengêkî mirandina zimanî ye.

Xelkê Kurd divêt vê rastîyê bibîne û di derheqê vê tehlîkeyê da serwext û agahdar be û beramberî vê polîtîka birandêr ya dewleta Tirkîyeyê reftareke berxwedêr nîşan bide û li zimanê xwe xwudan derkeve û di her xelek û baskê jîyanê da bi kar bîne. Heke Kurd dixwaze polîtîkên asîmîlasyonîst yên dewleta Tirkîyeyê pûç û betal bike û vala derêxe, hingê divêt di jîyana rojane da, di her reng kar û xebatên xwe da zimanê Kurdî bi kar bîne, bi zimanê xwe bijî û bi vî rengî zimanê xwe bide jîyandin. Xelkê Kurd, divêt zimanê xwe wekî elementê sereke yê hebûna xwe bibîne û bi vê berpirsiyarîyê rabe. Îro lezînen divêt bi îsrar Kurdî bête axivtin, her reng nivîskarî bi Kurdî bête kirin, li goreyî şert, mecal û îmkanan bi Kurdî perwerde bête dan û wergirtin.

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, KNK, berpirsiyarîya beramberî zimanê Kurdî karekî sereke yê hebûna neteweyî dibîne, wezîfeyeke man û nemanê qebûl dike û gazî xelkê Kurd dike ku bi vê bawerîyê di nav pratîkê da bin. Êrişkarîya asîmîlasyonîst ya dewleta Tirkîyeyê biçûk nebînin, sivik negirin û beramberî wê, jîyana xwe pêkve bi

Kurdî bijî. Eve hawara KNKyê ye û KNK hêvî û bawer dike ku xelkê Kurd dê li vê bang, gazî û hawara KNKyê xwudan derkeve.

Komisyona ziman û perwerdeyê ya KNKyê

08 Tîrmeh 2006, Bruksel

Ji teref komisyona ziman û perwerdeyê ve, li ser navê KNKyê nameyek hate amade kirin û bi înzaya serokê KNKyê, ji bo berpirsiyarên Yêkitîya Ewrûpayê hate şandin. Name li jêr e:

Bruksel, 10 Tebax 2006

Bo Olli Rehn

Komîserê karûbarê firehbûna Yêkitîya Ewrûpayê

Bo Matti Vanhanen

Serokwezîrê Fînlândê û serokê Konseya Ewrûpî

Wekî hûn jî car bi car dibêjin, dewleta Tirkîyeyê di vê prosesa endametîya Yêkitîya Ewrûpayê da wacibên xwe, hem bi giştî, hem jî spesîfîken di pîrsa Kurdî da, bi cih naîne. Di vê çarçoveyê da, bi giştî hewcehî û xwastekên xelkê Kurd adeta di rojeva dewleta Tirkîyeyê da cih nagirin. Hem bi têkoşîna xelkê Kurd, hem jî bi fişara Yêkitîya Ewrûpayê hindek guhorînokên qanûnî li ser perwerdeya zimanê Kurdî hatine kirin, belê ew jî di çarçoveya "kursên taybetî" da maye û daku ew jî di pratîkê da neête bi cih înan, hizaran astengên burokratîk, cizayî, polîsî û leşkerî derdêxin pêşîya xelkê Kurd.

Dewleta Tirkîyeyê hêj jî di pîrsa zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî da normalîzasyonê

pêkneînaye. Bi kar înan zimanê Kurdî bi serê xwe hêj jî dibe binasê girtin û hefsan. Xwastina perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi Kurdî hêj jî wekî sûcekî terorîstî têtê qebûl kirin û di warê perwerdeyê da jî çu hesab li ser zimanê Kurdî naête kirin. Dewleta Tirkîyeyê bi hemû rê û metodan polîtîka asîmîlasyonê bi îsrar didomîne. Ne rê dide ku Kurd bi xwe hindêk gava biavêjin û xwandingehan ava bikin û perwerdeyê bidin, ne jî bi xwe tiştêkê dike. Pirsê perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî ji teref dewleta Tirkîyeyê ve hatiye kilîl kirin û asê kirin. Mixabin ku Yêkîtîya Ewrûpayê jî di vî warî da jî çend gotin û krîtîkên dîplomatîk pêve tiştêkê nake û ev rehaveta YEyê cisaretê dide dewleta Tirkîyeyê ku şekala xwe bixuşukîne û nêzîkî çareseriyê nebe.

Dewleta Tirkîyeyê astengên qanûnî hêj jî ranekirine. Di serî da astenga herî mezin makqanûn bi xwe ye û maddeyên 3yê û 42ê gelek aşkera rê nadin perwerdeya bi zimanê Kurdî. Lê belê, ji bo guhorîna van maddeyan ne dewleta Tirkîyeyê mûyê xwe dilivîne, ne jî YEyê fişarê dibe ser Tirkîyeyê. Ji bilî van maddeyên makqanûnê jî, qanûnên cizayî jî hene û ji xwe bi derêxistina ”qanûna dijî terorê” jî asteng û barîyerên li ber perwerdeya bi zimanê Kurdî hatin xurt kirin.

Wekî hûn jî dizanin, zimanek heta hetayê bi axivtinê li ser pêya namîne û nikare li ber çerxa asîmîlasyonê jînde bimîne. Jîna zimanekê bi perwerdeyê dibe. Ziman û perwerde wekî sîstemekî jînde hevdu timam dikin û bi vê sîrkûlasyonê hem jînde dimînin, hem jî pêşve diçin. Dewleta Tirkîyeyê gelek bi zanahî naxwaze ku zimanê Kurdî bikeve nav sîstemê perwerdeyê ku zengîn nebe, bi pêş nekeve, her di warê axivtinê da bimîne ku di nav dem û salan da jar û lawaz û feqîr bimîne û hêdî hêdî jî ji tedawûlê rabe. Ev pratîka dewleta Tirkîyeyê divêt bo we xerîb nebe û ji alîyê we ve gelek ron û zelal bête zanîn.

KNKyê xwast ku vê rewşa negatîv bîne bîra we ku dewleta Tirkîyeyê, di nav prosesa endametiya YEyê da, jî teref we ve bi îsrar û mûeyyîde bête hişyar kirin û fişara li ser neête sist kirin. Em naxwazin gavê seetê li ser nifûs, cografya û dîroka xelkê Kurd û Kurdistanê agahîyan bidin we. Ji ber ku hûn jî waqîfî van fakta ne.

Tiştê ku KNK bi navê xelkê Kurd ji we daxwaz dike ew e ku hûn dewleta Tirkîyeyê bi norm û krîterên xwe ve serwest bikin, ku qedexa û astengên li ber perwerdeya bi zimanê Kurdî bi timamî rake û zimanê

Kurdî di nav sîstemê perwerdeyê da fermî bike û ji dibistana seretayî heta ûnîversîteyê perwerdeya Kurdî bike nav programa perwerdeya dewletê û di pratîkê da jî bi kar bîne. Gavikên ku heta îro hatine avêtin, helbet em biçûk nabînin, lê têra nakin ku ji xwe ew jî di pratîkê da bi kar naên.

Hêvîya me ew e ku YEyê lezînen vê pirsê perwerdeya bi zimanê Kurdî bîne serê rojeva xwe û digel dewleta Tirkîyeyê gotûbêj bike û encameke pozîtîv û pratîk derêxe meydanê ku zimanê Kurdî êdî di nav sîstemê perwerdeya fermî ya dewletê da bête bi kar înan.

KNK bi baldarî li ser vê pirsê radiweste û dê li hêvîya bersiva we be.

Digel rêz û silavên me.

Elî Yigit

Serokê KNKyê

**Li ser axivtina Kurdî
komisyona ziman û
perwerdeyê ya KNKyê
kampanya da dest pê kirin.
Daxuyanî li jêr e:**

Kampanyaya 8ê Îlonê

KNKyê, li goreyî biryara ”Komisyona Ziman û Perwerdeyê” 8ê Îlona 2006ê, kampanyayeke li ser axivtina Kurdî daye dest pê kirin ji bo Kurdistanê Bakur û dîasporayê. KNK baş dizane ku ev kampanyaye bi serê xwe paradokseke kûr e ji alîyê Kurda ve. Zimanek bi kampanyayan helbet naête rizgar kirin. Belê çiku Kurdî axivtin li bakur û dîasporayê her diçe kêmtir dibe, ev pêrabûnê wekî kampanya jî ji bo balkêşanê hewce ne û daku birûskêkê di serê xelkê me da biçeqînin divêt car bi car bêne kirin ku xelkê haj xwe hebe û bi vî rengî xelkê bête hişyar kirin. Ji ber ku xelkê me li bakur

û dîasporayê mixabin ku di jîyana rojane da jî hêdî hêdî Kurdî axivtinê terk dike.

Li Kurdistanê Bakur di dem û dezgehên fermî yê dewleta Tirkîyeyê da Kurdî axivtin hêj jî qedexeyê ew e ku sehmayê bi salan ya dewletê bi xurtî dom dike û rê li ber axivtina Kurdî digire. Ev reftara dewletê têtê zanîn. Lê belê, cihê mixabinîyê ew e ku xelkê me li saheyên jîyana xwe ya kesînî jî zimanê xwe Kurdî naaxive û di jîyana xwe ya rojane da jî Tirkî diaxive. Eve bi serê xwe rewşeke trajîk e. Xelkê me di warê axivtina Kurdî da, di bi kar înanana zimanê xwe da hindî hûn bêjin xemsar e. KNKYê bi vê biryara xwe xwast bala xelkê me bikêşe ser vê pirsê giran û bi giringî xelkê me hişyar bike ku ev çûne ne çûneke baş e, ne çûneke xêrê ye!.

Ji ber vê kampanyayê ev anons, slogan û spotên balkêşan û hişyarkirinê hatine amade kirin ku di serê xelkê me da wekî birûskekê biçeqin ku haj xwe bin û ji şaşîya xwe vegerin. Kurdî neaxivtin bi gotina herî nerm, sade û sivik ”şaşî” ye û divê ev şaşîye neête kirin.

“... Li Kurdistanê Bakur di dem û dezgehên fermî yê dewleta Tirkîyeyê da Kurdî axivtin hêj jî qedexeyê ew e ku sehmayê bi salan ya dewletê bi xurtî dom dike û rê li ber axivtina Kurdî digire. Ev reftara dewletê têtê zanîn. Lê belê, cihê mixabinîyê ew e ku xelkê me li saheyên jîyana xwe ya kesînî jî zimanê xwe Kurdî naaxive û di jîyana xwe ya rojane da jî Tirkî diaxive. Eve bi serê xwe rewşeke trajîk e. Xelkê me di warê axivtina Kurdî da, di bi kar înanana zimanê xwe da hindî hûn bêjin xemsar e. KNKYê bi vê biryara xwe xwast bala xelkê me bikêşe ser vê pirsê giran û bi giringî xelkê me hişyar bike ku ev çûne ne çûneke baş e, ne çûneke xêrê ye!..”

Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKYê bi armanca koordînekirina karûbarên ziman û perwerdeyê, kombûneke fireh digel organîzasyonên sosyopolîtîk û sosyokulturel û berpirsiyarên medyaya Kurdî li Kölnê pêkîna. Encama kombûnê û biryar li jêr in:

Kombûna 12ê Tebaxê li Kölnê bi serkevtî xilas bû

Bi koordînasyon û amadekarîya Komisyona ziman û perwerdeyê ya KNKYê li bajêrê Elmanya Kölnê bi beşdarîya Enstîtu, Akademî, Pena Kurd, yêkitî û komeleyên meslekî û bransî, nivîskar, şair, rojnamevan, ronakbîr, polîtîker û herweha şexsîyetan kombûneke berfireh di avahîyê Mala Kurd ”Kurdistan Haus”ê da pêkhat. Rojeva kombûnê li ser rewşa ziman, perwerdeya ziman û perwerdeya bi zimanê Kurdî ya bi giştî bû. Beşdaran bi detay rojev riberiz kir, gotûbêjên bikêr hatin kirin û di encam da tesbîtên giring hatin kirin û biryarên pratîk hatin wergirtin.

Di kombûnê da bi firehî li ser rewşa zimanê Kurdî, perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî, reftar û pozisyona dewletên dagîrker û kolonyalist û ya xelkê Kurd hate sekinîn. Piştî riberiz, analîz û komantarên piralî tesbîteke hevrayî hate kirin ku dewleta Tirkîyeyê li hemberî xelkê Kurd polîtîkên asîmilasyonîst di dereceya nînekirinê da bi kar tîne û şertên herî dijwar û wêranker yê ku zimanê Kurdî têda ye li Kurdistanê Bakur tîne dîtin. Digel vê polîtîka asîmilasyonîst ya dewleta

Tirkîyeyê, herweha ji gundîyê sade heta karker û karmend, polîtîker, nivîskar, şair, rojnamevan û pêkve ronakbîr, hunermend, ciwan, pîr, jin, mêr û bi çîn, navçîn, bask û kategorîyên xwe ve reftara xemsar ya xelkê Kurd ya beramberî zimanê xwe Kurdî jî hate tesbît kirin. Ev negatîvîyeta xelkê Kurd wekî bêpersiyariyeke kûr û paradoksal hate mana kirin. Li ser vê neaxivtina Kurdan ya bi zimanê xwe, bi micidahî hate rawestan û ev reftara xemsar ya xelkê Kurd ji şaşîyeke mezin wêdatir, wekî helandina xwe bi xwe, anku otoasîmilasyon, hate bi nav kirin û daku rê li ber vê yêkê bête girtin rêzeke xwastek û daxwazan hate kirin ku xelkê Kurd ji vê şaşîyê vegere.

Bi vê yêkê ve girêdayî herwisa rewşa Kurdên dîasporayê jî bi berfirehî hate axivtin û mixabin ev têkçûna zimanê Kurdî ya li meydana dîasporayê jî hate tesbît kirin û di neaxivtina Kurdî ya li dîasporayê da jî gunehkarîya xwe bi xwetî hate destnîşankirin û ev reftara xelkê Kurd ya bi zimanê xwe Kurdî neaxivtinê hate rexne kirin û herweha wekî bêpersiyariyeke kûr hate qebûl kirin û di encam da bang li xelkê Kurd hate kirin ku hem li Kurdistana Bakur, hem li dîasporayê, di nav malê da, li derve, di hemû bask û xelekên jîyanê da, digel hev bi zimanê xwe Kurdî biaxivin.

Li alîyê dî, beşdarên kombûnê gihiştin wê bawerîyê ku ev kar û xebata hevrayî ya di warê ziman û perwerdeyê da bi regekî xurt û organîze bête domandin. Li ber vê perspektîvê, ev terkîba kombûnê, di bin koordînasyona komisyona ziman û perwerdeyê ya KNKYê da, wekî "şêwra ziman û perwerdeyê" hate dîtin û berdewamîya wê hate daxwaz kirin. Herweha hate hêvî kirin ku KNK di çarçoveya van şêwran da, plan û projeyên li ser ziman û perwerdeyê amade bike û bi hevkarîya beşdarên şêwrê di pratîkê da bide realîze kirin.

Beşdarên kombûnê herweha programa KNKYê ya li ser kampanyaya 8ê Ilonê jî qebûl û teyîd kirin û ji bo pratîzekirina wê jî roleke aktîv wergirtin.

Li goreyî vê hevrayîyê kampanya, dê 8ê Ilonê li serbajêrê Belçîk Brukselê, li du bajêrên Elmanyayê, Köln û Berlînê û paralelî wan bi însiyatîva Enstîtuya Kurdî ya Stanbolê û Tevera Ziman û Perwerdeya Kurdî ya girêdayî Enstîtuya Kurdî ya Stanbolê, li bajêrê Stanbolê û li Diyarbekirê û herweha li goreyî şert û îmkanan li bajêrên dî yên Kurdistanê jî, bi şahî û bi kombûneke fireh ya çapemenîyê bête dest pê kirin.

Di kombûna şêwrê da bi giştî û firehî ev biryar hatin qebûl û tewsiye kirin:

BALKÊŞÎ

Ziman stûna ragir ya neteweyan e!
Gava ev stûna ragir şkest, îskelet hildiveşe!
Netewe bi zimanê xwe li ser pêya ne!
Zimanê Kurdî stûna ragir ya neteweyê Kurd e!
Vê stûnê neşkênin! Ragirin!
Bila jîyana Kurd bi Kurdî be!

HIŞYARÎ

Li Kurdistana Bakur û li dîasporayê zimanê Kurdî li ber asîmîlebûnê ye!
Zimanê xwe Kurdî biaxive ku asîmîle nebe!
Asîmîlebûna zimanê Kurdî, dawîya Kurdbûyîne ye!

Gelî Kurdan;

Zimanê we Kurdî li Kurdistana Bakur û dîasporayê li ber sekeratê ye, oksîjena jîyandina zimanê we axivtina Kurdî ye.
Şahîya xwe jî, şîna xwe jî bi Kurdî bikin.
Jîyana xwe bi Kurdî bijîn.
Kurdîniya xwe bi Kurdî bikin.
Zarokên we Kurdî dizanin? Hingê hûn xwe nas dikin.
Zarokên we Kurdî nizanin? Eve şerma we ye.

Mela û rêberên dînî yên Kurd;

Hûn ji kîjan dîn û mezhebî bin, îbadetî bi Kurdî bidine kirin.
Bila weiz û axivtin û şîretên we bi Kurdî bin.

Polîtîkerên Kurd;

Polîtîkê bi zimanê xwe Kurdî bikin.
Kombûnên xwe bi Kurdî bikin.
Di karûbarên xwe yên fermî da pêşîyê Kurdî biaxivin.

Jinên Kurd;

Hûn maka jîyanê ne, bi makzimanê xwe Kurdî biaxivin.
Digel zarokên xwe Kurdî biaxivin, zarokên xwe bi makzimanê xwe Kurdî bigihînin û dûndeha xwe bi Kurdî bidin domandin.

Organîzasyonên sosyopolîtîk, sosyokultürel û sosyoekonomîk;

Di nav dezgehên xwe da, digel hev bi zimanê xwe Kurdî biaxivin, di karûbarên xwe da Kurdî bi kar bînin.

Gerîllayên Kurd;

Di nav xwe da, di perwerdeya xwe da, di têkilîyên digel xelkê xwe da Kurdî bi kar bînin, Kurdî biaxivin.

Karmendên Kurd;

Di nav dayre û dezgehên fermî da, di têkilîyên digel hev da bi zimanê xwe Kurdî biaxivin.

Karkerên Kurd;

Di cihên xwe yê kar da, di fabrîke û dezgehên xwe da, digel hev bi Kurdî biaxivin.

Kardêr, esnaf û dikandarên Kurd;

Di kirîn û firotna xwe da, di kiryarî û firoşkarîya xwe da, di nav xwe da, digel karker û xebatkarên xwe yê Kurd, digel hev û digel bikirên xwe yê Kurd, zimanê xwe Kurdî biaxivin.

Xwandekarên Kurd;

Di dibistan, enstîtu, akademî, fakûlte û ûnîversîteyên xwe da, digel hev Kurdî biaxivin, aktîvîteyên xwe bi Kurdî bikin.

Zarok û ciwanên Kurd;

Zarokîya xwe, ciwanîya xwe, bi Kurdî bijîn, yarî, leyiz û aktîvîteyên xwe bi zimanê xwe Kurdî bikin, di nav xwe da, digel hev Kurdî biaxivin.

Daybabên Kurd;

Zarokên we paşeroja we û xelkê we ne. Digel zarokên xwe Kurdî biaxivin. Bi zimanê xwe Kurdî axivtinê hûn dê paşeroja xwe û ya zarokên xwe jî û ya xelk û welatê xwe jî ronahî bikin.

Girtîyên Kurd;

Baş têtê zanîn ku dewlet teroreke mezin li ser we girtîyên polîtîk bi kar tîne ku hûn bi zimanê xwe Kurdî digel xuyanîyên xwe neaxivin. Her di serî da li Îmralîyê jî nahêlin ku rêberê KKKyê Abdullah Ocalan digel xwûşk û birayê xwe bi Kurdî biaxive. Ev qedexê li ser we hemû girtîyên polîtîk jî dom dîke. Belê divêt hûn berxwe bidin, vê bêdadîya dewletê qebûl nekin, red bikin û di girtîxaneyan da digel hev, di seradanîyan da jî digel daybab, bira û xwûşk, lêzim, xizim, kesûkar û hemû xuyanîyên xwe bi îsrar Kurdî biaxivin.

Şehridarên Kurd;

Di nav şehridarîyên xwe da digel karker û karmendên xwe yê Kurd, bi zimanê xwe Kurdî biaxivin. Digel xelkê xwe Kurdî biaxivin. Di xizmetguzarîya şehridarîyê da xelkê xwe teşwîq bikin ku hem Kurdî biaxivin, hem jî serlêdanên xwe bi devkî jî be Kurdî bikin.

Ronakbîr, nivîskar, şair û rojnamevanên Kurd;

Hûn pêşengên ronahîkirina civatê ne û bi kir û kiryarên xwe ve nimûneyên li ber çavê xelkê xwe ne. Di edetkirina axivtina Kurdî da jî bibin pêşeng û nimûne. Di jîyana xwe ya ronakbîrî da, di karûbarên xwe yê nivîskarîyê da, di jîyana xwe ya rojane da, di têkilî û danûstandinên xwe da zimanê xwe Kurdî bi kar bînin, Kurdî biaxivin û bidine axivtin.

Hunermendên Kurd;

Bi dengê xwe, bi firçeyê xwe, bi hemû enstrûman, alet û dezgehên xwe, bi hunera hiş û bira xwe ya bi ronahî bibine hunermendê Kurdî axivtinê jî. Hunera xwe bi Kurdî bikin, Kurdî biaxivin û bidine axivtin.

Pêşniyarên konkret û spesîfik;

Ehmed Türk [Serokê Partîya Civata Demokratîk –DTPyê]; Di kombûn û karûbarên partîyê da pêşîyê Kurdî biaxive!

Aysel Tuğluk [Cihgira serokê DTPyê];

Di karûbarên partîyê da pêşîyê Kurdî biaxive!

Osman Baydemîr û hemû şehridarên Kurd;

Di xizmetguzarîya xwe da pêşîyê Kurdî biaxivin!

Hemû DTPyî; Kurdî bikin zimanê sereke di nav partîya xwe da!

Partîyên binyad Kurd; Kurdî biaxivin û Kurdî bikin zimanê sereke di nav partîyên xwe da!

Komele û hemû dem û dezgehên Kurdî; Di nav xwe da, di nav lokalên xwe da Kurdî biaxivin!

ROJ TV; Di nav xwe da, digel hev, di lokal, kantîn, kafeterya û ofîsên xwe da Kurdî biaxivin!

Yeni Özgür Politika û rojnameyên proKurd;

Di nav xwe da, di lokal û ofîsên xwe da digel hev Kurdî biaxivin, di karûbarên xwe da bi serekeyî zimanê xwe Kurdî bi kar bînin!

Di enstîtu û komeleyan da;

- bi rêkûpêkî û disiplîn kursên ziman,
- kursên gihandina mamostayên Kurdî,
- semînerên zanyarî li ser ziman bêne dan.

Di hemû organîzasyonên Kurdî da civînên xwandinê bêne amade kirin û digel nivîskarên Kurd suhbet û gotûbêj bêne kirin.

Medyaya Kurdî bi anons û spotan baldarîya xelkê ya axivtina zimanê Kurdî bilind bigire. Rêzefilm û filmên karton yê bi Kurdî di TVyên Kurdî da bêne weşandin.

Di TVyan da programên sinetkarî û hunera destî û suhbetê yê jinan bi Kurdî bêne amade kirin. Di TVyan da panelên ciwanan bi Kurdî bêne kirin.

Di TVyan da programên zarokan yê pedagojîk yê bi Kurdî bêne weşandin.

Di radyoyan da jî her reng program û skeçên Kurdî, ku axivtin û guhdarkirina Kurdî bi baldarî teşwîq bikin, bêne weşandin.

Ji bo Yêkitîya Ewrûpayê bi hevrayî nameyên li ser xwasteka perwerdeya zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî bêne şandin ku YEyê di prosesa endametîya Tirkîyeyê da fişara xwe xurttir bike.

Dîsa ji bo organîzasyonên navneteweyî jî nameyên hevrayî bêne şandin ku destekê bidine bizav û aktîvîteyên xelkê Kurd yê li ser xwasteka perwerdeya bi zimanê Kurdî li Tirkîyeyê.

Kurdên li Ewrûpayê, bo hukümetên welatên ku lê hevvelatî ne, nameyan bişînin û daxwazê ji wan bikin ku tesîrê li ser dewleta Tirkîyeyê bikin ku perwerdeya bi zimanê Kurdî bikeve nav sîstemê fermî yê dewletê.

Kurdên li Ewrûpayê ji bo dana perwerdeya Kurdî, ji îmkânên dewletên lê dijîn da di dereceya herî bilind da istifade bikin.

Spotên kampanyayê;

- Suhbet?
- Bi Kurdî!
- Kombûn?
- Bi Kurdî!

- Riberiz?
- Bi Kurdî!
- Telefon?
- Bi Kurdî!

- Li dibistan û zanîngehan axivtin?
- Bi Kurdî!
- Yarîya li yarîgeha?
- Bi Kurdî!

- Li mal axivtin?
- Bi Kurdî!

- Li çayxane û qehwexaneyan leyiz û suhbet?
- Bi Kurdî!

- Chat?
- Bi Kurdî!

Gazîya zarokê Kurd;

Babo, dayê, digel min bi Kurdî biaxivin!

Amadekar û koordînasyona kombûnê:

KNK - [Komisyona Ziman û Perwedeyê]

Beşdarên kombûnê:

Enstîtuya Kurdî ya Brukselê

Enstîtuya Kurdî ya Berlînê

Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê

Akademîya Hunermendên Kurd

Pena Kurd

Konfederasyona Komeleyên Kurd, Kon-Kurd

Yêkitîya Mamostayên Kurdistanê

Yêkitîya Rojnamevanên Kurdistanê

Yêkitîya Elewîyên Kurdistanê

Federasyona Komeleyên Ezidîyan

Civaka Islamî ya Kurdistanê

Yêkitîya Ciwanên Kurdistanê

Yêkitîya Jinên Azad – Ewrûpa

Newaya Jin

Heyva Sor ya Kurdistanê

Yeni Özgür Politika
ROJ TV
Radyoya Dengê Mezopotamyayê
Hevgirtina rewşenbîrên Kurdên rojavayê
PJAK
PYD
Not:
Enstîtuya Kurdî ya Stanbolê ji ber binasên teknîkî nikaîn beşdarî kombûnê bibin, belê serokê enstîtuyê Samî Tan bi nameyê piştevaniya kombûnê kampanyayê kirin.
Nivîskarên ku bi nameyê desteka xwe kivşkirî jî ev in;
Seyitxan Anter
Necîb Balayî
Jan Dost
Berken Bereh
Feratê Dengizî
Mehmet Tanrikulu

”... Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê, KNK, berpirsiyarîya beramberî zimanê Kurdî karekî sereke yê hebûna neteweyî dibîne, wezîfeyê man û nemanê qebûl dike û gazî xelkê Kurd dike ku bi vê bawerîyê di nav pratîkê da bin. Êrişkarîya asîmîlasyonîst ya dewleta Tirkîyeyê biçûk nebînin, sivik negirin û beramberî wê, jîyana xwe pêkve bi Kurdî bijîn. Eve hawara KNKyê ye û KNK hêvî û bawer dike ku xelkê Kurd dê li vê bang, gazî û hawara KNKyê xwudan derkeve...”

Daxuyanîya lezîn

Di kombûnê da herweha li ser bûyer û rûdanên aktûel yê polîtîk jî bi navê “Daxuyanîya lezîn” daxuyanîyeke kurt hate dan. Daxuyanî li jêr e:

Di demê ku kombûna bi koordînasyona KNKyê ya digel organîzasyonên sosyopolîtîk, sosyokultûrel, temsîlkarên medyaya Kurdî, ronakbîr, polîtîker û şexsiyetan li bajêrê Elmanya Kölnê pêkhatî dom dikir da, bûyer û pêşhatinên bêyûm rûdan li Kurdistanê û cografyaya Yêkitîya Ewrûpayê. Di serî da dewleta Tirkîyeyê dîsa ve dest bi plan, dek û dolap û desîseyên xwe yê nasyar kir û hem di cepheyê leşkerî da, hem jî di cepheyê polîtîk û dîplomatkî da êrişkarîya xwe fireh kir. Li milekê destên xwe yê bi xwûn gihandin çiyayên Kurdistanê, li milê dî çembera êrişkarîya xwe gihande nav Kurdistana Başûr ku dîsa ve di navbeyna hêzên Kurdistanê da provakasyon û têkvedanan bike. Li ser van hewildanên xwe yê dijminane, di meydana diplomatîk da jî fişareke mezin bire ser dewletên endamên Natoyê û Yêkitîya Ewrûpayê ku xebata bizava neteweyî ya Kurdistanê li derveyî welat jî bide tengav kirin. Mixabin ku hindêk dewletên Yêkitîya Ewrûpayê, bo nimûne Holend û Elmanyayê jî reftareke negatîv nîşanî bizava neteweyî ya Kurdistanê dan û di van çend rojên nêzik da sê polîtîkerên Kurd, Muzaffer Ayata, Nedîm Seven û Riza Erdoxan girtin. Girtina van hersê polîtîkerên Kurd di serê her tiştî da, ne huqûqî ye, bi timamî polîtîk e û primê dide polîtîkên dewleta Tirkîyeyê ku hemberî xelkê Kurd êrişkartin be. Elmanya û Holend wekî du dewletên xwudan giranahî li nav Yêkitîya Ewrûpayê, bi van tarz kiryarên xwe yê negatîv û antî demokratîk zerarê digihînin têkilîyên xwe yê digel xelkê Kurd. Kombûna me bi timamî û yêkdengî ve reftara dewletên Holend û Elmanyayê bi xemgînî û endîşe taqîb dike. Kombûna me gazîya xwe digihîne dewletên Holend û Elmanyayê ku zûtîrîn dem van hersê polîtîkerên Kurd berde.

Kombûna me herweha bangî hemû hêz û kesên neteweyî jî dike ku di van rojên tengav, bi tehlîke û aloz da, bi berpirsiyarîya neteweyî rabin û rê nedin leyiz û provakasyonên dewletên dagîrker û di dereceya herî bilind da hevkarî û piştevanîya navxweyî xurt bikin.

Kombûna 12ê Tebaxê li Kölnê

KNK - [Komisyona Ziman û Perwedeyê]
Enstîtuya Kurdî ya Brukselê
Enstîtuya Kurdî ya Berlînê
Enstîtuya Kurdî ya Stockholmê
Akademîya Hunermendên Kurd
Pena Kurd
Konfederasyona Komeleyên Kurd, Kon-Kurd
Yêkitîya Mamostayên Kurdistanê
Yêkitîya Rojnamevanên Kurdistanê
Yêkitîya Elewîyên Kurdistanê
Federasyona Komeleyên Ezîdîyan
Civaka Islamî ya Kurdistanê
Yêkitîya Ciwanên Kurdistanê
Yêkitîya Jinên Azad – Ewrûpa
Newaya Jin
Heyva Sor ya Kurdistanê
Yeni Özgür Politika
ROJ TV
Radyoya Dengê Mezopotamyayê
Hevgirtina rewşenbîrên Kurdên rojavayê
PJAK
PYD

12ê Tebaxê 2006, Köln

Kampanya 8ê Îlonê tête dest pê kirin

Ji 8ê Îlonê pêve her Kurd divêt pêşîyê xwe, paşê jî dora xwe hişyar û serwest bike ku edetê Kurdî axivtinê bête xurt û zêde kirin. Ji ber vê yêkê yêkem mueyyide "berpirsiyarî" ye. Bila her Kurdek, Kurdê ku bi zimanê xwe neaxive bi nermî hişyar bike û

têbigihîne ku ji vê qusûr û kêmasîya xwe vegere û Kurdî biaxive.

Bila her Kurd beramberî zimanê xwe bi berpirsiyarî rabe û bi axivtina zimanê xwe berpirsiyarîya xwe layiqen bîne cih.

Ji 8ê Îlonê pêve di bin koordînasyona KNKyê da, dê li ser vê kampanyayê bi micidahî bête rawestan û dem û dezgeh û organîzasyonên ku di saheya xwe da Kurdî axivtinê nekin edet, dê bêne aşkera kirin.

Tête hêvî kirin ku her Kurd, her dezgeh û organîzasyona ku bi doza Kurd û Kurdistanê ve rabûyî, dê vê berpirsiyarîya xwe ya beramberî zimanê xwe Kurdî bînin cih û edetê Kurdî axivtinê di hemû danûstandin, têkilî û jîyana xwe da serdest bikin.

14yê Gulanê, Cejna Zimanê Kurdî û fînala kampanyayê

Ji 8ê Îlonê pêve li Kurdistana Bakur û meydanên dîasporayê, her dezgeh û rêxistina Kurdî dê li goreyî şîyan, şert û îmkanên xwe bi her reng û cureyî kampanyayê bidomîne û di 14yê Gulana 2007ê da jî bi hevrayî û geşahîyeke bilind Cejna Zimanê Kurdî dê bête pîroz kirin. Kampanya wekî aktîvîte dê bi vê fînala cejna zimanê Kurdî bi dawî be, belê Cejna Zimanê Kurdî dê wekî tradîsyon hersal bête pîroz kirin û herweha edetkirina axivtina bi Kurdî dê bi berpirsiyarî û baldarîyeke bilind dom bike û divêt bête domandin.

KNK - [Komisyona Ziman û Perwedeyê]

“... Bila her Kurd beramberî zimanê xwe bi berpirsiyarî rabe û bi axivtina zimanê xwe berpirsiyarîya xwe layiqen bîne cih...”

Ev banga li jêr, bi mexseda agahdarî û têgihandina kampanyayê wekî hejmaraya taybetî ya KNK Bultenê hate amade kirin û belav kirin.

Gelî Kurdan,

Li Kurdistanê Bakur û meydanên dîasporayê jîyana zimanê Kurdî di dereceya alarma sor da ye.

Zimanê Kurdî li bakur û dîasporayê kêmtir axivtin. Zordariya dewleta Tirkîyeyê tete zanîn, belê herweha xemariya xwe bi xwetî jî heye.

Ji ber vê yekê, KNKYê kampanya, seferberî û hemleya Kurdî axivtinê daye destpêkirin û ev gave di 8ê Îlonê da tete avêtin.

KKK jî wekî endama KNKYê, bi timamî sistem, hêz û îmkânên xwe ve û hemû kes û hêzên neteweyî piştevanîya vê gavê dikan.

Beramberî zordariya dewleta Tirkîyeyê û pêkve asîmilasyonê, berxwedana herî mezin Kurdî axivtine.

Bang û hawara me ev e:

Kurdî biaxivin!

Bi îsrar Kurdî biaxivin!

Bi rik Kurdî biaxivin!

Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKYe

**“... Beramberî
zordariya dewleta
Tirkîyeyê û pêkve
asîmilasyonê,
berxwedana herî
mezin
Kurdî axivtine...”**

Serokê Komisyona Ziman û

Perwerdeyê ya KNKYê,

ROJAN HAZIM,

bi munasebeta destpêkirina

kampanyayê danezanek

pêşkêş kir:

**Danezana kampanya,
seferberî û hemleya
8ê Îlonê**

Bo xelkê Kurd,

Xelkê me yê rencdar, xelkê me yê mezlûm, xelkê me yê bi siyanet, xelkê me yê fedakar, xelkê me yê têkoşer û berxwedêr, xelkê me yê bi rû û rûmet û serbilind, xelkê me yê hêja,

Dewleta Tirkîyeyê eve serê dehan salan e ku nîrê zulmê ji ser stuyê we neînaye xwarê û vê zordariya xwe jî bi hemû reng û metodên hind zalimane bi kar tîne ku li çu derên dinyayê naêne dîtin. Her di serî da çu kolonyalîstan zimanên xelkên kolonî ji binî û qutbir qedexe nekirin, di nav beraşên aşê asîmilasyonê da nehêran, belê dewleta Tirkîyeyê eve kir û hêj jî dewam dike. Çu kolonyalîstan zimanê xelkên kolonîyên xwe bi ”quruş”an ciza nekir, belê dewleta Tirkîyeyê eve kir. Çu kolonyalîstan xelkên kolonîyên xwe hinde neşkandin, bê siyanet nekirin, belê dewleta Tirkîyeyê ev kirêtiye kir û hêj jî didomîne. Çu kolonyalîstan nav û hebûna xelkên kolonîyên xwe yêkser red û inkar nekirin, belê dewleta Tirkîyeyê eve kir û vê kiriyara xwe ya bêdad berdewam dike.

Çu kolonyalîstan plan û projeyên birandina xelkên kolonîyên xwe çenekirin, belê dewleta Tirkîyeyê li goreyî birandina xelkê Kurd polîtîka afirandin û di pratîkê da jî bi kar înan. Dewleta Tirkîyeyê û xelkê Tirk, ji destpêka damezrandina komara nû pêve, çavên xwe li xelkê Kurd girtin, xelkê Kurd nedîtin, nexwastin bibînin û Kurd nîne qebûl kirin...

Lê belê, vê polîtîka dewleta Tirkîyeyê, ew di vî demê dirêj da îna ber îflasê. Ew xelkê Kurd yê ku bi îsrar nedixwastin bibîn, xwe bi heşmeteke mezin nîşanî dewlet û xelkê Tirk da. Di rikeberîya dewleta Tirk û xelkê Kurd ya di prosesa nînekirina neteweyê Kurd da, Kurd serkevtin û hebûna xwe parastin û xwe li ser pêya hêlan. Zincîr û prangayên dewleta Tirkîyeyê pare nekirin, yêk bi yêk hatin şkandin û belav kirin. Ji têkoşîna bi salan ya polîtîk û organîzativ heta berxwedana bihadar ya çekdarî, xelkê Kurd xwe li ber hemû birandin û helandinên dewleta Tirkîyeyê ragirt û parast. Lê dewleta Tirkîyeyê hêj jî polîtîka xwe ya tradîsyonel ya dijî xelkê Kurd didomîne. Hêj jî zulm û zora li ser zimanê Kurdî, kultur û hunera Kurdî dom dike. Xelkê Kurd dijî nîrê zulma dewleta Tirkîyeyê di çarêka dawîyê ya sedsala 20an da çawa li 15ê Tebaxa 1984ê fişeka azadîyê teqand û agirê azadîyê gur kir, vê gavê jî divêt gaveke sîvîl û demokratîk bi xurtî biavêje û dijî asîmîlasyona li ser zimanê Kurdî hemleya xwe bilind bike, bişihe û rabe depareke maratônî.

Dewleta Tirkîyeyê gelek sistematîk rê li ber axivtina Kurdî, bi kar înana zimanê Kurdî digire û barîyeran ava dike. Nahêle ku zimanê Kurdî bikeve nav sistêmê perwerdeya fermî ya dewletê. Beramberî vê polîtîka dewleta Tirkîyeyê ya wêranker, divêt xelkê Kurd di serî da bi zimanê xwe biaxive, bi axivtin û bi kar înana zimanê xwe Kurdî, reaksiyona xwe nîşanî dewletê bide û bi vî rengî li zimanê xwe, li nîşana hebûna xwe xwudan derkeve û polîtîka wan ya asîmîlasyonîst di pratîkê da pûç û betal bike.

KNKyê bi vê armancê kampanya, seferberî û hemleya axivtin û bi kar înana zimanê Kurdî amade kirîye û starta vê pêrabûnê îro, anku 8ê Îlonê dide. Sezona perwerdeya li dibistanên seretayî 11yê Îlonê li Tirkîye û Kurdîstana Bakur dest pê dike. Zarokên Kurd dîsa ve dê bêyî perwerdeya bi zimanê Kurdî dest bi dibistanê bikin. Perwerdeya dewleta Tirkîyeyê ya xwerû bi Tirkî û bêyî Kurdî, mejî şuştina zarokên Kurd e, asîmîlekirina zarokên Kurd e ku ev zarok paşeroja neteweyê Kurd in. Dewleta Tirkîyeyê bi vê qedexetîya li ser zimanê Kurdî û perwerdeya bi zimanê Kurdî, neyarîya xelkê Kurd dike û dixwaze paşeroja xelkê Kurd tarî bike. Lewma, divêt xelkê me li zimanê xwe xwudan derkeve û bi îsrar di timamî jîyanê da Kurdî bi kar bîne û Kurdî biaxive. Panjehra polîtîka antî Kurd û antî Kurdî ya dewleta Tirkîyeyê, Kurdî axivtin e, Kurdî bi kar înane. KNK hawara xwe digihîne xelkê xwe, xelkê Kurd, ku li zimanê xwe xwudan derkevin, bi zimanê xwe, bi Kurdî biaxivin.

Xelkê me yê bi qedir û qîmet,

Dewleta Tirkîyeyê esasen şerê mezin beramberî zimanê Kurdî dide û hemû jîyana Kurdî Tirkîze kirîye. Divêt xelkê me, xelkê Kurd, vê polîtîka mirandinê pûç bike, berevajî bike û jîyana xwe pêkve Kurdîze bike.

Li seranserî Kurdîstana Bakur û bajêrên dîasporaya Kurd, bila jîyana Kurd pêkve bi Kurdî be û divêt wisa be!

Kurdî axivtin, bizava man û nemanê ye!
Gundî, bajêrî, jin, mêr, zarok, mezin, feqîr, zengîn, pêkve xelkê me yê ezîz, xelkê Kurd, xemsarîyê nekin, bi zimanê xwe, bi Kurdî biaxivin!

Kurdî axivtina bi îsrar û rik, bersiv û berxwedana herî mezin û bihadar e beramberî zulma dewleta Tirkîyeyê!

Dewleta Tirkîyeyê 26ê Îlonê "Cejna Zimanê Tirkî" pîroz dike. Beşdarî vê pîrozîyê nebin û xwe amadeyî pîrozkirina "Cejna Zimanê Kurdî" ya li 14yê Gulana 2007ê bikin!

Xelkê me yê serbilind,

Bi armanca azadîyê herne pêş, herne pêş, belê me bi zimanê xwe Kurdî herne pêş!

Bila ji nihe ve xezaya we ya ji bo zimanê Kurdî pîroz be!

ROJAN HAZIM

Endamê Konseya Rêvebir ya KNKyê

Serokê Komîsyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKyê

08ê Îlonê 2006

Not:

Starta kampanyayê, 8ê mehê roja eynîyê, di ROJ TVyê da bi programa "Rasterast"ê zindî hate dan. Danezan jî eynî rojê di rojnameya Yeni Özgür Politikayê da hate weşandin.

**"... Xelkê me yê
serbilind,
Bi armanca azadîyê
herne pêş, herne pêş,
belê me bi zimanê xwe
Kurdî herne pêş!.."**

Biryara destek û piştevanîya KKKyê

Konseya Rêvebir ya KKKyê daxuyanîyek da û piştevanîya vê kampanyaya ku KNKyê organîze û koordîne kirîye, kirin.

Wisa digotin di beyanata xwe da:

”Vê dawîyê KNKyê jî îlan kirîye ku kampanyaya zimanî bidin dest pê kirin. Dîsa komîteya ziman û perwerdeyê ya KKKyê jî bangeke bi vî rengî kirîye. Nihe em wekî Konseya Rêvebir ya KKKyê gelek giring dibînin ku ev kampanya û bang pêkve di sewîyeya neteweyî da bêste dest pê kirin...” [Ji daxuyanîya KKKyê, li ajansa ANFyê ya bi Tirkî. 21.08.2006]

Daxuyanîya Konseya Rêvebir ya KNKyê

Konseya rêvebir ya KNKyê di 1ê Îlonê, roja aşîya cîhanê da kombû. Bi vê munasebetê KNK vê roja bihadar li xelkê Kurd û timamî xelkên cîhanê pîroz dike. Konseya rêvebir ya KNKyê digel ku di roja aşîyê da kombû, belê mixabin ku hem Kurdistan, hem rojhilatanavîn, hem jî cîhan gelek dûrî aşîyê ye. KNK hevî dike ku aşîyeke dadyar bêste welatê me Kurdistanê û timamî cîhanê.

Li Kurdistanê, li rojhilatanavîn û li cîhanê pêşhatinên giring û balkêş rûdidin. Dewletên dagîrker yê navçeyê bi çu awayî dest ji politikên xwe yê antî demokratîk û antî Kurd bernadin û bi her awayî êrişkarîya xwe didomînin. Piştî ku parçeyê Kurdistanê yê başûr hatîye azad kirin û di çarçoveya Iraqa nû da bi sîstemê federal avabûyî were, dewletên Tirkîye, Iran û Sûrîyeyê politikên xwe yê beramberî xelkê Kurd di dereceya nînekirinê da didomînin. Bi taybetî Tirkîye û Iran di warê politik û leşkerî da bi tifaqeke plankirî ya bêyûm ji du alîyan ve êrişî bizava neteweyî dikin û di van operasyonan da fişarê dibin ser başûra azadbûyî jî. Tirkîye ji aliyê xwe ve hemû kartên xwe di meydana navneteweyî da jî bi kar tîne û baskê êrişkarîya xwe digihîne Amerîka û cografyaya Yêkitîya Ewrûpayê jî. Di van rojên aloz

da Tirkîye û Iran di nav tixûbên xwe yê “fermî” da jî mengeneyê fetisandinê li ser stuyê xelkê Kurd dişidînin. Tirkîyeyê ew qanûnên li goreyî prosesa endametîya Yêkitîya Ewrûpayê guhortî jî, tirpan kirin û ablûkaya li dor bizava neteweyî ya xelkê Kurd tehkîmtir kir. Balkêş e ku rejîma Iranê heta nihe zimanê Kurdî qedexe nekirîbû, ew jî ketîye ser dewsa dewleta Tirkîyeyê û dest pê kirîye astengan derdêxe beramberî bi kar înanan zimanê Kurdî di nav sîstemê îdarî da. Di vî warî da Sûrîye jî kêmi Tirkîye û Iranê namîne û wan jî fişara ser xelkê Kurd îna ye dereceya astengkirina zimanê Kurdî. KNK van pêşhatinên ne bi xêr û bêyûm ji bo paşeroja xelkê Kurd tehlîke dibîne û hem van politikên Tirkîye, Iran û Sûrîyeyê şermizar dike, hem jî bangî xelkê Kurd dike ku refên xwe sist nekin û ew çeperên heta nihe hatine qazanc kirin berze nekin, saxlemtir bikin û berxwedana xwe ya dijî van rejîman pêş bêxin û xurttir bikin.

Li aliyê di, di meydana navneteweyî da jî bi taybetî bi însiyatîva Tirkîyeyê bayekî dijwar û wêranker tête rakirin li ser bizava neteweyî ya xelkê Kurd. Di vî warî da reftar û pozisyona dewleta Tirkîyeyê tête zanîn ku bi timamî antî demokratîk e û bi israr van politikên xwe li ser tifaqdarên xwe yê rojavayê jî ferz dike. Mixabin cîhana rojavayê jî norm û krîterên xwe yê humanîter û demokratîk adeta bînpê dike û bi timamî li goreyî berjewendiyên xwe yê ekonomîk hereket dike û xwastekên dewleta Tirkîyeyê tîne cih û dijî kar û xebatên qanûnî û legal yê xelkê Kurd operasyonên polisî pêktîne û girtinên ne huqûqî dike. Li cografyaya Yêkitîya Ewrûpayê, bi taybetî Elmanya serkêşîya van tarz muameleyên antî demokratîk dike. Di meha Tebaxê da Elmanya û Holendê politikêrên Kurd, bi timamî li goreyî tîkilîyên xwe yê digel dewleta Tirkîyeyê yê di warê bazirganîyê da, girtin ku ev reftara wan zerareke mezin dide bizava azadîxwaz ya xelkê Kurd. Amerîka jî mixabin ku tam di demê pêşvebirina projeya xwe ya demokratîzekirina rojhilatanavîn da dikeve dava dewleta Tirkîyeyê ku Tirkîye ji vê pozisyona Amerîkayê istifade dike û politikên xwe yê antî Kurd realîze dike.

KNK giring dibîne ku bala cîhana rojavayê bikêşe ku ev politikên wan yê di paralela dewleta Tirkîyeyê da tîne domandin, her di serî da zerarê digihînin berjewendiyên wan yê dewletî û herweha bizava bi giştî demokratîzekirina rojhilatanavîn jî tête tehrîb kirin. Di serî da Amerîka û pêkve cîhana rojavayê, divêt baş bizanin ku li rojhilatanavîn yêkem hêza aktîv û dînamîk ya demokrasîyê, bizava neteweyî

ya xelkê Kurd e. Amerîka û cîhana rojavayê tinê bi hevkarî û piştevaniya xelkê Kurd dikarin polîtîka û projeyên xwe yê navçeyê di rê bibin û bi cih binin. KNK hêvî dike ku Amerîka û Yêkitiya Ewrûpayê dê li norm û krîterên demokrasîyê xwudan derkevin û polîtîkên xwe li ser esasê tifaqdarîya digel xelkê Kurd amade bikin. KNK ji bo pêkînanana alyansa di navbeyna bizava neteweyî ya xelkê Kurd û Amerîka û Yêkitiya Ewrûpayê anku bi giştî cîhana rojavayê da, çî hewce be dê bike ku cepheyê demokrasîyê li rojhilatanavîn xurt bibe.

KNK li seranserî Kurdistanê bangî pêşengên polîtîk û timamî xelkê Kurd dike ku li ser berjewendiyên neteweyî tifaqa navxweyî xurt bikin, ji reftarên ku tifaqa neteweyî dînemît dikin dûr bikevin û piştevaniya neteweyî di maksîmûm dereceyê da nîşanî hevdu bidin û rê û fîrsetê nedin ajawe û tîkvedanên dewletên kolonyalîst û dagîrker.

KNK herweha deklaryona KKKyê ya di derheqê çareserîya pîrsa xelkê Kurd da li Kurdistanê Bakur jî giring dibîne. KNK di wê bawerîyê da ye ku xelkê Kurd jî wekî hemû xelkan mafdar e ku li ser ax û welatê xwe azad û serbest û serbixwe bijî. Belê di prosesa têkoşîna azadîyê da li goreyî şert, îmkan û konjonktûrê û herweha di çarçoveya reelpolîtîka cîhanê da, her reng projeyên çareserîyê maqûl dibîne. Li ber vê perspektîvê pêşniyara KKKyê di vê qonaxê da gaveke pêşve û pozîtîv e û di xizmeta aşîyê da ye. KNK di kombûna xwe ya di 1ê îlonê, roja aşîyê ya cîhanê da, piştevaniya vî planê KKKyê dike û hêvî dike ku terefê dewleta Tirkîyeyê jî li goreyî berjewendiyên xelkê xwe bifikire û vî destê aşîyê yê xelkê Kurd bigire û rê li ber aşî û azadîyê veke.

KNK 8ê îlonê seferberî, kampanya û hemleya axivtina Kurdî jî dide dest pê kirin. Lewma KNK dubare bangî xelkê Kurd li bakur û meydanên dîasporayê dike ku Kurdî axivtîna sist negirin, bi îrsar û rik li zimanê xwe xwudan derkevin û li goreyî kampanya û seferberîya axivtina Kurdî ya KNKyê bi rê bikevin.

KNK çêkirina barajên li Kurdistanê û bi taybetî jî projeya Hesênkeyfê, xelegeke êrişkarîya li ser xelkê Kurd û Kurdistanê û kêmanîyên li Kurdistanê dibîne. Dewleta Tirkîyeyê bi çêkirina van barajan dixwaze ekolojî û demografîya Kurdistanê xirab bike. Baraja Hesênkeyfê di bin kirasê enerjîya elektrîkê da kavil û wêrankirina zengînîya dîrokî ya xelkên Mezopotamyayê, xelkên Kurdistanê, Kurd û Asûrî-

Suryanî-Kildanîyan e. Dewleta Tirkîyeyê bi çêkirina barajan vandalîzmê dike û eser û avadanîyên kevin û dîrokî binav dike.

Dewleta Tirkîyeyê dîsa ve kiryarên xwe yê provokatîv didomîne û tecrîda li ser rêberê KKKyê Abdullah Öcalan dişidîne. KNK bangî dewleta Tirkîyeyê dike ku dest ji van tarz polîtîkên, ku ne di xêra xelkan da ye, berde. Herweha KNK gazî xelkê Kurd dike ku vê reftara dewleta Tirkîyeyê protesto û şermizar bikin.

KNK reftar, kiryar û şiddeta li ser jinên Kurd yê bi navê “namûs”ê, ku esasen wekî tradîsyonên kevn û paşverû têne domandin, ji bo pêşveçûn û paşeroja civata Kurdî tehlîke dibîne û gazî xelkê Kurd dike ku wekhevîya jin û mêr biparêzin û piştevaniya bizava jinên Kurd ya ji bo wekhevîyê bikin.

KNK bi dengê bilind bang û gazî dike ku xelkê Kurd li cografyaya Yêkitiya Ewrûpayê dengê xwe bikin yêk, destên xwe bidin hev û di festîvala navneteweyî ya Kultura Kurdî ya 14. ya li bajêrê Elmanyayê, Gelsenkirchenê, bigihin hev û hêz û qudreta xwe nîşanî dost û dijmin bidin.

Di encam da, KNK di roja aşîya cîhanê da, hemû kiryarên terorane yê ji teref dewlet anjî rêxistinane ve têne kirin şermizar dike û xwezî û hêvî dike ku aşîya dadyar bibe qîsmetê xelkê Kurd û hemû cîhanê.

**Konseya Rêvebir ya KNKyê
1ê Îlonê 2006, Bruksel**

“... KNK reftar, kiryar û şiddeta li ser jinên Kurd yê bi navê “namûs”ê, ku esasen wekî tradîsyonên kevn û paşverû têne domandin, ji bo pêşveçûn û paşeroja civata Kurdî tehlîke dibîne û gazî xelkê Kurd dike ku wekhevîya jin û mêr biparêzin û piştevaniya bizava jinên Kurd ya ji bo wekhevîyê bikin...”

KNKyê li ser girtina serokê PÇDKyê, Dr. Faîk Gulpî du name bo PDK û YNKyê şandin. Name li jêr in:

9ê Ilonê 2006

9ê Ilonê 2006

Nameya KNKyê ya li ser girtina serokê Partîya Çareserîya Demokratîk ya Kurdistanê [PÇDK], **Dr. Faîk Gulpî**

Ji bo polîtîburoya **Partîya Demokratîk ya Kurdistanê** [PDK]

Birayên hêja,

Wekî hûn jî dizanin, serokê PÇDKyê Dr. Faîk Gulpî ji teref polîsê dayreya asayîşa Silêmanîyê ve hatîye girtin.

Di serî da divêt em bi we bidin zanîn ku hem PÇDK wekî rêxistin, hem jî Dr. Gulpî endamên Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK] ne. Ji ber hindê em wekî KNK, bi girtina endamê me nerazî ne û vê rûdanê em êşandine. Em dixwazin bawer bikin ku PDK jî wekî rêxistineke neteweyî, bi girtina serokê partîyeke neteweyî nerazî ye. Gelek aşkera em dixwazin bêjin ku girtina Dr. Gulpî, ne huqûqî ye, bi timamî polîtîk e û ya rastî ev tarz reftar jî me ber bi endîşeyan ve dibe.

KNK zemînê bîr û hissîyata neteweyî ye. Lewma em vê bûyerê di çarçoveya berjewendîyên neteweyî da ji şaşîyê wêdatir tehlîke dibînin. Dr. Faîk Gulpî serokê partîyeke legal e, nav û navnîşana wan kîvş e û partîya wan di nav sîstemê qanûnî û demokratîk da xebata xwe dike. Huqûq û qanûn divêt ji bo herkesê wekhev bi kar bêt. PDK bi xwe jî heta duhî mexdûrê reftar û polîtîkên antî demokratîk bû û dijî sîstemê antî demokratîk têkoşîn dida.

Lewma PDK ji jîyana xwe ya polîtîk baş dizane ku ev tarzê antî demokratîk û keyfî tete çî manayê û encamên çawan dide. Vêca em wekî KNK hêvî dikin ku PDKya bira, dê bi vê pîrsa ne huqûqî û ne qanûnî û antî demokratîk ve mijûl be û hevkarîyê bike ku serokê PÇDKyê, Dr. Gulpî zûtîrîn dem bête berdan.

KNK gelek bi micidahî û giringî li ser vê pîrsê radiweste û li hêvîya bersiva we ya pozîtîv e. Digel rêz û silavên me yên germ û birayane.

Konseya Rêvebir ya KNKyê

Nameya KNKyê ya li ser girtina serokê Partîya Çareserîya Demokratîk ya Kurdistanê [PÇDK], **Dr. Faîk Gulpî**

Ji bo polîtîburoya **Yêkîtiya Niştimanî ya Kurdistanê** [YNK]

Birayên hêja,

Wekî hûn jî dizanin, serokê PÇDKyê Dr. Faîk Gulpî ji teref polîsê dayreya asayîşa Silêmanîyê ve hatîye girtin.

Di serî da divêt em bi we bidin zanîn ku hem PÇDK wekî rêxistin, hem jî Dr. Gulpî endamên Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK] ne. Ji ber hindê em wekî KNK, bi girtina endamê me nerazî ne û vê rûdanê em êşandine. Em dixwazin bawer bikin ku YNK jî wekî rêxistineke neteweyî, bi girtina serokê partîyeke neteweyî nerazî ye. Gelek aşkera em dixwazin bêjin ku girtina Dr. Gulpî, ne huqûqî ye, bi timamî polîtîk e û ya rastî ev tarz reftar jî me ber bi endîşeyan ve dibe.

KNK zemînê bîr û hissîyata neteweyî ye. Lewma em vê bûyerê di çarçoveya berjewendîyên neteweyî da ji şaşîyê wêdatir tehlîke dibînin. Dr. Faîk Gulpî serokê partîyeke legal e, nav û navnîşana wan kîvş e û partîya wan di nav sîstemê qanûnî û demokratîk da xebata xwe dike. Huqûq û qanûn divêt ji bo herkesê wekhev bi kar bêt. YNK bi xwe jî heta duhî mexdûrê reftar û polîtîkên antî demokratîk bû û dijî sîstemê antî demokratîk têkoşîn dida.

Lewma YNK ji jîyana xwe ya polîtîk baş dizane ku ev tarzê antî demokratîk û keyfî tete çî manayê û encamên çawan dide. Vêca em wekî KNK hêvî dikin ku YNKya bira, dê bi vê pîrsa ne huqûqî û ne qanûnî û antî demokratîk ve mijûl be û hevkarîyê bike ku serokê PÇDKyê, Dr. Gulpî zûtîrîn dem bête berdan.

KNK gelek bi micidahî û giringî li ser vê pîrsê radiweste û li hêvîya bersiva we ya pozîtîv e. Digel rêz û silavên me yên germ û birayane.

Konseya Rêvebir ya KNKyê

Kombûna KKKyê ya digel ronakbîr û polîtîkerên Kurdistanê li Kölnê, li salona avahîyê Akademîya Hunermendên Kurdistanê pêkhat

**Beşdarên kombûnê bi yêkdengî piştevanîya
biryara agirbesa Ocalan û KKKyê kirin.**

Agir bes e, lê têkoşîn ne bes e!

Li Kurdistanê û di cografyaya der û cîran da, bûyer û qewimîn bi hêla bayê birûskê rûdidin. Polîtîkên antî Kurd dewam dikin, lê xelkê Kurd jî ji bo pûç û betalkirina van polîtîkên wêranker têkoşîneke xurt dide. Ji milekê ve Iran û Sûrîye, ji milê dî ve Tirkîye, pêkve dixwazin bêhnê li Kurdan çik bikin. Di van atraksîyonên antî Kurd da rola sereke û koordînatorkirina dewleta Tirkîyeyê dike. Tirkîye hem bi çu awayî bersiva xwastekên xelkê Kurd nade, hem jî Iran û Suriyeyê jî di vî warî da li ser polîtîka xwe ya antî Kurd motîve dike...

Li alîyê dî îro li rojhilatanavîn, ku Kurdistan merkeza navçeyê ye, pêşhatineke nû dest pê kirîye. Amerîka aktîven li navçeyê ye û dixwaze saheya projeya xwe ya demokratîzekirina navçeyê firehtir bike. Xeleka pêşîn Iraq bû û ew xelek hate vegirtin û Iraqa nû ji bo Kurdan jî derekî nû yê jîyanê vekir û xelkê Kurd li ser parçeyê başûr xwe organîze kir û îdareya xwe, di nav sîstemê federal yê Iraqa nû da, xwe bi xwe di rê dibe... Di muhtemel gava nû da Iran û Sûrîye hene ku xelkê me di wan parçeyan da jî bigihe daxwazên xwe. Konjonktûr di van şertan da dest dide Kurdan û xelkê me jî divêt ji vê rewşa pozîtîv istifade bike. Prosesa antî statuko bi Iraqê ve dest pê kirîye û eve dê dewam bike. Pêşengîya vê prosesê guhorîner ya li navçeyê bi giştî hêza neteweyî ya xelkê Kurd dike. Li Iraqê wisa bû û eve li Iran, Sûrîye û Tirkîyeyê jî wisa ye. Serê vê projeya guhorîner êdî gihiştîye van dewletan jî. Lê Tirkîye jî, Iran jî, Sûrîye jî bi israr der û pencereyên xwe li vê guhorîne adeta girtine... Helbet ev israra wan di van şertan da pare nake û hêzên guhorîner jî bi israr in û bi biryar in. Bi taybetî

hêza neteweyî ya xelkê Kurd ji hemû cepheyan ve fişareke mezin dibe ser van dewletan û qabiliyeta manewrayên wan yên antî Kurd teng dike.

Bi taybetî di van rojan da KKKyê ji bo bakur gaveke nû da dest pê kirin. Rêberê KKKyê Abdullah Ocalan teklîfa agirbesê kir. KKKyê jî di beyana xwe ya îro da (30ê Ilonê) fermîyen ev teklîfa Ocalan qebûl kir û ev biryara xwe ji bo bîr û rehîya giştî ya welat û cîhanê deklare kir. Agirbes fermîyen 1ê Çirîyê (meha deh) dest pê dike. Helbet divêt baş bête zanîn ku agirbes naête manaya têkoşînbesê. Têkoşîna xelkê Kurd dê heta bi destxistina azadîyê dom bike. Lê belê, yêk ji karakterîstîka têkoşîna polîtîk jî ew e ku hemû rê û îmkanan ji bo bi destxistina xwastekên neteweyî bi kar bînin. Xelkê Kurd di têkoşîna azadîyê da li çareyê digere, li aşîyêke dadyar û maqûl digere, li pêkhatineke demokratîk digere digel dewleta Tirkîyeyê. Vêca ev gav û teklîfa nû jî hemleyek e ji vê têkoşîna bi salan têtê domandin. Gerçî dewleta Tirkîyeyê guhê xwe, çavê xwe li bang û gazî û teklîfên xelkê Kurd digere, belê xelkê Kurd divêt di xwastek û pêşniyarên xwe yên ji bo çareserîya dadyar da bi biryar û israr be. Ev biryardarîya xelkê Kurd û pêşengîya polîtîkê dê di wijdana xelkên cîhana humanîter da deng vede û destekeke mezin bi dest ve bîne. Em hêvidikin ku ev dengê aşîyê yê xelkê Kurd di wijdana xelkê Tirk û wijdana xelkên navçeyê da jî deng vede û ew jî fişarê bibin ser dewletên xwe ku dawîyê li şer û êrişkarîyê bînin.

Di demên wisa da, di demên avêtina gavên nû da, biryardarîya xelkê Kurd jî giring e. Çawa di demên dijwarîya şer da xelkê me bi biryar e, tifaqa xwe xurt digere, di demên ku teklîf û pêşniyarên ji bo çareserîyê tene kirin da jî hewce ye ku bi tifaq bin, daku tesîr û pozîsyona xwe xurt û saxlem bikin ku ev hemle û polîtîka di pratîkê da encamgir be. Lewma ev agirbesa ji alîyê Ocalan û KKKyê ve hatîye îlan kirin, ne tinê tenahîyê ji bo bakur tîne, herweha tesîra pozîtîv li ser parçeyên dî jî dike û bi taybetî fişara li ser Kurdistanê Başûr ya ji milê Tirkîye, Iran û Suriyeyê ve lawaz dike. Ji ber van encamên berfireh, divêt di serî da partîyên desthilatdar yên li başûr heta rojhilat û başûrarojavayê, mil bidine vê prosesê agirbesê ku neête sabote kirin, di pratîkê da neête bêfonksîyon kirin. Desteka pîralî ya hêzên neteweyî di vê qonaxê da, dê rê li ber diyalog, têkilî û piştgirîyeke fireh ya neteweyî jî veke ku eve xwasteka hemû hêzên neteweyî ye.

Di vê prosesê nû da roleke mezin jî dikeve ser milê ronakbîrên Kurd ku hem jî alîyê ramanî ve, hem jî

ji alîyê têgihandin û di serwestkirina xelkê da aktîv bin û bi pêşniyar û ramanên nû û berwer ve prosesê pêşbêxin û xurt bikin.

Bi bîr û hizirên neteweyî, tesîskirin û parastina tifaqa neteweyî, hêza herî mezin e di demên wisa krîtîk da. Hêzên neteweyî, di demên ku di bin însiyatîva wan da gav têne avêtin, divêt bi biryar bin û di maksîmûm dereceyê da hevkarî û piştevanîya navxweyî tesîs bikin, daku agirbes borînde nebe, tam bereks, bi encam û destkevtên xwe ve mayînde be.

Di demekî ku hem Yêkitîya Ewrûpayê, hem Amerîkayê, hem jî ronakbîrên Tirkîyeyê û herweha Partîya Civakê ya Demokratîk li Tirkîyeyê banga agirbesê dikirin da, bi navê bizava neteweyî ya xelkê Kurd ji teref Ocalan ve teklîfkirina agirbesê û dana biryara agirbesê ji teref KKKyê ve, gaveke giring e û divêt bête destek û xurt kirin. Mînimîlizekirina rîskên vê prosesê, bi hevkarî û tifaqa herî fireh ya neteweyî dibe.

Em jî wekî ronakbîr û polîtîkerên Kurd ji vê kombûna ku ji alîyê KNKyê ve hatiye organîze kirin li Kolnê, piştevanîya xwe kivş dikin û destekê didine banga agirbesê û hêvî dikin ku ev gava nû, şert û îmkânên aşîyêke maqûl, dadyar û mayînde pêkbîne. Li milê dî heke agirbes du alî be, dê rêya aşîyê zûtir û kêmjantir bête vekirin. Lewma em hêvî dikin ku xelk û ronakbîrên Tirkîyeyê jî bi aktîvî û bi îsrar fişarê bibin ser dewleta xwe ku ew jî agirbesê îlan bike û bersiveke pozîtîv bide daxwaza xelkê Kurd ya aşîyane.

Bi hêvîya ku têkoşîna xelkê me serbikeve.

Kombûna Kölnê

30ê îlonê 2006, Köln

Not:

Kombûna Kölnê endamê konseya rêvebir ya KNKyê Felemez Başboğa û endamê KNKyê Maşallah Öztürk organîze kirin. Di kombûna Kölnê da, serokê KNKyê Elî Yigit axivtina destpêkê kir. Piştî wî jî endamên konseya rêvebir ya KNKyê Felemez Başboğa û Rojan Hazim û endamê KNKyê Maşallah Öztürk axivtin.

"... em hêvî dikin ku xelk û ronakbîrên Tirkîyeyê jî bi aktîvî û bi îsrar fişarê bibin ser dewleta xwe ku ew jî agirbesê îlan bike û bersiveke pozîtîv bide daxwaza xelkê Kurd ya aşîyane..."

Daxuyanîya Stockholmê

Bi însiyatîv û bangdêrîya KNKyê, bi slogana "Yêkitîya Neteweyî", li Stockholmê, digel ronakbîr û polîtîkerên Kurdistanê kombûnek pêkhat

KNKyê û beşdarên kombûnê, ronakbîr û polîtîkeran, bi yêkdengî piştevanîya agirbesê kirin

Ji bo bîr û rehîya navxweyî û ya derve

Bizava bi giştî neteweyî ya xelkê Kurd di nav çembera agir da têkoşîna xwe didomîne. Di demekî hinde sojer da bûyer û qewimînên giring têne pêş. Li milekê dewletên kolonyalîst ji sê cepheyan ve êrişên bi koordîne tînin ser xelkê Kurd, li milê dî bi armanca têkbirina parçeyê azadbûyî yê başûr jî planên bêyûm têne çêkirin û realîze kirin. Di nav vê hercûmercê da aktorên cîhana rojavayê ku serkêşîya wan Amerîka dike, zebat û aktîvîteyên xwe yên demokratîzasyona navçeyê didomînin.

Xelkê Kurd jî li hemû parçeyan têkoşîna azadî û demokrasîyê dide. Di vê armanca nezîk da, bizava neteweyî ya xelkê Kurd û hewildanên Amerîka û cîhana rojavayê paralelî hev in û di vê têkoşînê da hevçeper in. Ji ber vê hevçeperîyê, Kurdistanê Başûr îro bûye meydana herî xurt û ewle ya lojîstîk bo planê demokratîzasyona navçeyê. Hindî ku hevçeperîya têkoşîna demokrasîyê pêş dikeve, dewletên statukoperês yên navçeyê, Tirkîye, Îran û Sûriye, qedera xwe bi hev ve girêdidin û dijî bizava neteweyî ya xelkê Kurd û vê alyansa demokrasîyê, bi hev ra şer dikin. Di hilweşandina statukoya navçeyê

da pêşengîya demokrasîyê, wekî hêzeke xwumal ya navçeyê, bizava xelkê Kurd dike. Di vê rikeberîya digel sê dewletên antî demokratîk û statukoperêş da jî, rol û pozîsyona bizava neteweyî ya li bakur cihekî giring û taybetî digire. Di warê enîya şerê çekdarî da hêza herî organîze, xurt û bi koordîne hêza bakur e. Ji xwe cepheyê statukoperêş û antî demokratîk jî ji teref dewleta Tirkîyeyê ve tete kumanda û koordîne kirin.

Di nav van şertên hinde têkilav, kompleks û dijwar da, pêşengîya bizava neteweyî ya bakur, KKKyê [PKK], beramberî dewleta Tirkîyeyê biryara agirbesê da. KKK bi vê biryarê dixwaze ji bo dîyalog û prosesa pêkînanan aştîyeke mayînde û hazirkirina şertên çareserîyeke berdewam ya digel dewleta Tirkîyeyê keysî bide. Ji xwe hem ronakbîrên Kurd û Tirk, Partîya Civakê ya Demokratîk, DTP, li milekê, hem jî Amerika û Yêkîtîya Ewrûpayê jî ji milekê ve bang dikirin ku di gava pêşîn da ji teref PKKyê ve agirbesek bête îlan kirin. Li ser van gazî û danûstandinên pîralî, rêberê KKKyê Abdullah Ocalan bû bangdêrê agirbesê û KKKyê jî ev teklîfa Ocalan qebûl û îlan kir. Agirbes, di prosesên têkoşînên azadîyê da merheleyên keysdana dîyalog û çareserîyan e. Bizava neteweyî ya xelkê Kurd beramberî dewleta Tirkîyeyê ev însîyatîve wergirtîye û ev gave ji teref bîr û rehîya navxweyî û ya derve gelek bi baldarî hate pêşwazî û destek kirin.

Ev agirbes, di demê hewildanên KNKyê yên ji bo "Yêkîtîya Neteweyî" da, pêkhat. Ev gava nû, van pêrabûnên KNKyê yên di warê yêkîtîya neteweyî da giringtir dike. Prosesên agirbesê, ji demên şerê germ naziktir in. Demê agirbesê, hişyarî û baldarîyeke mezintir û taybetîtir dixwaz e. Rîsk û tehlike û provakasyon û têkvedanên pirreng û pîralî di demên wisa da zêdetir rûdidin, bi zanahî tene organîze kirin. Di van dem û şertan da, mobîlîzekirina hêz û dînamîkên neteweyî jî zêdetir lezîn dibe. Lewma hem ji bo serkevtina bizava neteweyî, hem jî ji bo rêlêbirîna van dek û dolab û desîseyên li ser prosesa agirbesê, tifaqa navxweyî giring e, pêdivî ye. Beramberî planên dijmin yên bi her awayî, yêkem hêza lêveker, tifaqa navxweyî, anku yêkîtîya neteweyî ye.

Ji ber vê yêkê, em hem wekî KNK, hem jî ev terkîba kombûna Stockholmê, ronakbîr û polîtîkerên Kurd, yên Kurdistanê, bangî hemû hêz û dînamîkên Kurd, yên Kurdistanê dikin ku, nezîkî hev bin, dîyaloga navxweyî pêkînin, kanalên danûstandinê vekin, têkilîyan germ bikin, heta ku yêkîtîyeke rêkûpêk ya

neteweyî bête pêkînan, qet nebe di nav koordîneyeke neteweyî da bin.

KNK amade ye ku bibe zemînê koordînasyona hemû hêz û dînamîkên neteweyî. Ji ewlehîya Kurdistanê Başûr bigirin heta parastina çeperên maf û azadîyên li hemû parçeyên Kurdistanê, hêza parêzer, tifaqa neteweyî ye. Garantîya destkevtên neteweyî, garantîya çeperên stratejîk, di serî da hêza neteweyî bi xwe ye. Nav û model çî dibe bila bibe, platformên ku hemû hêzên neteweyî di nav xwe da dicivînin û bi koordîne seferber dikin, di hemû prosesên têkoşîna azadîyê da zemînên kolektîv in û esas garantî jî ev e.

Kombûna Stockholmê jî bi van bîr û bawerîyan, hem destekê dide biryar û prosesa agirbesê, hem jî ji kîjan bîr û bawerîyê bin ferq nake, gazî hemû kes, hêz û dînamîkên neteweyî dike ku ber bi pêkînanan tifaqa neteweyî ve gavan biavêjin, li ser berjewendîyên neteweyî di maksîmûm dereceyê da hevgirtineke neteweyî pêkînin.

Li alîyê dî, serkevtina bizava neteweyî ya xelkê Kurd ji hemû alîyan ve tete manaya demokratîzasyona cografîyaya rojhilatanavîn. Lewma kombûna Stockholmê herweha bangî cîhana demokratîk û humanîter, Amerika û Yêkîtîya Ewrûpayê jî dike ku piştevanîyeke xurt, aktîv û dînamîk digel bizava neteweyî ya xelkê Kurd bikin.

KNK û beşdarên kombûna Stockholmê

8 Çirî [Oktober] 2006, Stockholm

"... Ev agirbes, di demê hewildanên KNKyê yên ji bo "Yêkîtîya Neteweyî" da, pêkhat. Ev gava nû, van pêrabûnên KNKyê yên di warê yêkîtîya neteweyî da giringtir dike..."

Endamê Konseya Rêvebir ya

KNKyê,

ROJAN HAZIM

di kombûna Stockholmê

da axivt. Axivtina li ser

„Yêkitîya Neteweyî” li jêr e:

Gelî beşdarên, mêhvanên hêja,

KNKyê [Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê], rêzekombûn amade kirine ji bo gotûbêjkirin û riberizkirina pirsê ”Yêkitîya Neteweyî”. Berî nihe li Berlîn û Kölnê jî hatin kirin û ev mijar bi berfirehî hate axivtin û encamên bikêr derketin... Ev kombûna Stockholmê jî xelekeke ji wan kombûnan. Em hêvî dikin ku ev kombûne jî dê encamên têker û bikêr derêxe meydanê û xizmeta yêkitîya neteweyî bike. Em baldarîyeke germ û têr û tijî dibînin di salonê da û spas dikin ku hûn hatin û bêşik em dê ji dîtin û pêşniyarên we sûdê werbigirin. Ez jî bi navê KNKyê dubare dibêjim, hûn hemû bi xêr hatin.

Ev kombûna li ser yêkitîya neteweyî, di şertên agirbesa PKK û KKKyê da tête kirin. Lewma bi destûra we em dixwazin li ser vê yêkê jî çend gotina bêjin... Agirbes eve çend roj e hatîye îlan kirin. Xuya ye ku ber û piştên vê gavê hatine vehûnandin û paşê hate îlan kirin. Hêzên ku berpirsiyarîya şer û têkoşîna azadîyê hilgirtine ser milên xwe, helbet mecbûr in ku bi plan û projeyên makropolîtîk hereket bikin. Berpirsiyarî ne tinê domandina şer e, herweha di prosesa şer û têkoşîna da, afirandina bi dehan rê û metodên çareserîyê ye jî... Lewma agirbes di demên têkoşîna da keysdanên çareserîyê ne... Ji ber hindê gelek normal e ku bizava neteweyî ya xelkê Kurd vî keysî pêşkêşî bîr û rehîya bi giştî ya terefan bike, daku çareyên maqûl bêne dîtin û peyda kirin... Di vê çarçoveyê da, îlana agirbesê reftareke polîtîk e, aqilana ye, maqûl e...

Di demên agirbesan da hêz û şîyan û pozisyona terefan di çî dereceyê da ye, helbet giring e, lê ji bo xizmeta prosesa çareserîyê gavên wisa jî pêdivî

ne ku bêne avêtin... Dijmin her gav agirbesên ji teref opozisyonê ve têne îlan kirin, wekî zeaf, jar û lawazbûna wan biha dîke... Ji xwe ew dijmin heke dewleta Tirkîyeyê be, bi timamî îzah ew e. Li goreyî dewleta Tirkîyeyê, opozisyona Kurd, li goreyî ferhenga wan ”terorîst”, gava agirbes dibêjin, ew îşareta têkçûyîna wan e, manewraya xwe li ser pêya hêlanê ye!.. Di agirbesên salên borî da jî ev yêke hate dîtin... Belê digel ku terefê dijmin wisa mana bike jî, biryareke rast û di cih da ye ku hêza opozisyonê polîtîkên bi vî rengî jî bide pêş û ji van hewildanan çareyan biafirîne... Lewma agirbesa ku PKK û KKKyê bi teklîfa rêberê xwe Abdullah Ocalanî îlan kirî, li goreyî konjonktûra îro jî di cih da ye...

Bi giştî prosesa têkoşîna demên şerê germ bin, demên şerê sar bin, demên agirbes û aşîyê bin, ferq nake, bêtî rîzîko û tehlîke nîne. Ji ber vê yêkê, ev demê agirbesê jî bi rîsk û tehlîkeyan ve tijî ye... Li vê derê, xala giring ew e ku demê agirbesê bi hişyarî û aqilane bête kontrol, koordîne û kumanda kirin... Demên agirbesê ji demên şerê germ zêdetir baldarî û hişyarîyê dixwazin. Hêza ku pêşengîya vê prosesê dike, mecbûr e ku hemû îmkanên xwe, hemû hêz û şîyana xwe ji bo silametîya vê gavê seferber bike, daku proses hem ji rêya xwe neête varê kirin, hem jî neête sabote kirin... Ji demê agirbesê ji bo armanc û berjewendîya têkoşîna azadîyê îstîfade kirin, bi vê hişyarî û serwestîyê ve girêdayî ye...

Di agirbesa vê carê da, em dibînin ku formateke nû heye... Di serî da, di konjonktûreke wisa da pêkhat ku Kurdistanê Başûr bûye dewleteke federal û di organîzekirina vê gavê da xwudan rol e... Li milê dî, Amerîka û Yêkitîya Ewrûpayê di dewreyê da ne û xwudan rol in... Dîsa, ronakbîrên Tirkîyeyê û yên Kurdistanê û herweha partîya mezin ya ku di saheya legal da temsîla Kurda dike, DTP, [Partîya Cîvaka Demokratîk], bangdêrên prosesê wisa bûn... Anku cepheyê bangdêr yê agirbesê gelek fireh e, hem çarçoveyê neteweyî, hem jî navneteweyî heye û ev karakterîstîke giringîyeke cudayî agirbesên dî dide vê agirbesê... Ne hatîbin bi nav kirin jî, li paşê agirbesê hindê çavdêr, anjî têkildar têne dîtin... Gelo bazarek digel dewleta Tirkîyeyê hatîye kirin, halîhazir naête zanîn, lê dûrî ihtimalê nîne ku bi hindê dezgehên dewlet û hukûmetê ve temaseke îndîrekt ya ji ser Amerîka û dewletên dî yên rojavayê û rêvebirîya Kurdistanê Başûr ve pêkhatibe... Ji vehunandina prosesê sînyalên temaseke wisa têne his kirin...

Gelo dê encameke ku di xêra xelkê Kurd da bide an

ne?.. Ji alîyê dewleta Tirkîyeyê ve ev ihtimale dûr xuya dike, lê ji alîyê tesîra bîr û rehîya navxweyî û ya navneteweyî ve, dê encamên pozîtîv bide û merkezên xwudan desthilat yên ku berjewendîyên wan di navçeyê da heyî dê bi rengekî pozîtîvtir nezîkî pirsgerêka Kurd û hêza pêşeng PKKyê bibin ku eve dê xizmeta amadekirina zemînê çareserîyê bike... Dîsa ev prosese dê keysê baldarîyêke mezin bide ji bo bizava neteweyî ya li rojhilat û rojavayabaşûr...

Di vî demê agirbesê da, hem divêt têkoşîna sîvîl û demokratîk li bakur ji berê xurttir bête pêşxistin, hem jî giranahîyêke mezin divêt ji bo têkoşîna rojhilat ya dijî rejîma Iranê bête nîşandan... Herwisa dijî rejîma Sûrîyeyê jî têkoşîneke berfireh bête bilind kirin... Konjonktûra îro heyî ya navçeyê û navneteweyî di şertên agirbesê da dê baştir biteyise ser bizava parçeyên rojhilat û rojavayabaşûr... Herweha ev prosesa agirbesê dê presa li ser parçeyê azad yê başûr jî kêmkirina bike ku eve jî destkevteke ji vî prosesa agirbesê...

Lê di vî xalê da, karê herî giring ew e ku, hêz û kesên neteweyî bi tifaqî vî prosesê destek bikin, li agirbesê xwudan derkevin û bi yêkgirtinî rê li ber provakasyonan bigirin ku proses di bin kontrola bizava neteweyî ya xelkê Kurd da pêşbikeve...

Garantîya herî mazin dîsa ve hevgirtina navxweyî ya neteweyî ye... Rê nedan anjî kêmkirina rîsk û tehlîkeyan di vî prosesê da, bi tifaqa navxweyî dibe. Eve jî berpirsiyarîyêke neteweyî ye û divêt hemû dînamîkên neteweyî vî berpirsiyarîyê nîşan bidin û li goreyî vî hereketê bikin û piştevanîya prosesa agirbesê bikin...

Belê, heke em dîsa ve bêne ser pîrsa bi giştî yêkîtiya neteweyî; ev gotina "yêkîtiya neteweyî", ev gotina "efsûnî", çu cara jî rojeva me Kurdan nakeve, lê mixabin ku çu cara jî nebûye xala sereke û lezîna ya rojeva me Kurdan. Gelo ma eve bi serê xwe ne paradoksek e?.. Ji ber ku li cîhana modern edet e, gava pîrsek lezînen hate serê rojevê, di eynî lezîniyetê da jî tete çareser kirin û wekî pîrs ji halê tete rakirin. Ji xwe di nav civatên modern û pêşketî da, pîrseke bi vî rengî „yêkîtiya neteweyî“ jî nîne. Ew êdî gihiştine wê qonaxê ku gava tûşî pîrs û pîrsgerêkên ku tevahî neteweyî girêdide, tîn, rasyonel hereketê dikin, hêza aqil bi kar tînin û di nav diyalog û danûstandîneke maqûl da encameke hevpar derdêxin meydanê û di pratîkê da jî bi kar tînin û bi hevrayî, bi reftareke neteweyî xwe ji pîrs û pîrsgerêka ku neteweyî girêdide, xilas dikin. Belê mixabin ku em Kurd hêj jî vî gihiştîniyê bi hizaran kîlometre dûr in.

Lewma jî ev efsûnîya gotina „yêkîtiya neteweyî“ her diçe bêqîmet dibe di nav me Kurda da. Gava jî „yêkîtiya neteweyî“ tete behs kirin, bi rû û awireke xerîb li mirov tete nêrîn!. Heçku tete gotin, „dîsa ev pîrs!“...

Vêca em Kurd ketine vî halî... Nihe em dê dîsa behsê „yêkîtiya neteweyî“ bikin û ez di çavên we da his dikim ku hûn jî, helbet gelek bi heqqane, „ma dîsa ve yêkîtiya neteweyî!“ dibêjin... Ez çî bêjim?!.. Belê gelî mêhvanan, dîsa û dîsa ve „yêkîtiya neteweyî!“ Tika ye awirên xwe li me tûj nekin... Em dîsa ve hatine digel we li ser pîrsa „yêkîtiya neteweyî“ biaxivin, riberizê bikin, gotûbêjê bikin... Çî bikin, dîyar e ku hewcedarîyêke mezin bi vî mijarê heye ku ji rojevê nakeve... Heta ku çareser jî nebe, em dê hêj gelek li ser biaxivin, serê hevdu biêşînin... Ez bêjim, ev pîrse berdikeve ku em li ser bi demên dirêj rawestin, xwe pê biwestînin... Encam giring e; heke em bi van kombûn, axivtin, riberiz û gotûbêjan bigihin yêkîtiya neteweyî, ma çî ji vî baştir û pîroztir e...

Boçî yêkîtiya neteweyî?

Gava li ser yêkîtiya neteweyî tete axivtin, li dor hizaran nimûneyên cîhanê tete zivirîn... Çarçoveyên teorîk tene danan û gelek hewilên di tene kirin... Eve hemû jî dikarin bêne kirin... Lê em di wê bawerîyê da ne, ev pîrse çîku gelek hatîye axivtin, jî gelek alîyan ve çarçoveyên wê yên teorîk hatine zelal kirin, nimûneyên navneteweyî hatine dan... Lewma vî carê em dixwazin hema yêkser û konkret li ser pratîka navxweyî rawestin û jî pratîka xwe ya van deh salên dawîyê bigihin encamê...

Me go, boçî yêkîtiya neteweyî?.. Daku em bersivê bidin, rewşa heyî ya li ber çavan, bi xetên stûr kivş bikin.

Statuya kolonîtiya Kurdistanê, heke em parçeyê başûr jê derêxin, -ku êdî xelkê me li wî parçeyî gihiştîye azadîya xwe û xwe, xwe bi xwe li ser axa xwe îdare dike, jîyana xwe di rê dibe-, li sê parçeyan dom dike. Li van hersê parçeyan jî hem zor û zulma dewletên kolonyalîst, hem jî têkoşîna xelkê me ya antî kolonyalîst, têkoşîna azadîyê dom dike. Pozîsyonên dewletên dagîrker û kolonyalîst di hemû rûyên jîyanê da li ser antî Kurdîtiyê dewam dike. Dewletên kolonyalîst û dagîrker, hem di nav xwe da yêk bi yêk, hem jî bi hev ra bi koordîne dijî bizava neteweyî ya xelkê Kurd şerekî wêranker didin. Anku çeperê dijîmin di nav xwe da zelal e, yêkgirtî ye û bi vî tifaqa xwe beramberî xelkê Kurd çik radiwestin...

Belêm, di çeperê têkoşîna azadîyê da eynî pozisyona zelal, yêkgirtî û bi tifaq naête dîtin. Cepheyê Kurd, di nav xwe da belav e, dijîtiya navxweyî di maksîmûm dereceyê da ye. Hêz û kesên neteweyî ew enerjîya ku beramberî hev serf dikin, li beramberî dijmin serf nakin. Dîroka hêz û kesên neteweyî ji milekê û hetta bi giranî ve, bi şerê navxweyî ve tijî ye. Kurd ji duhî heta îro, şûna ku gora dijmin bikolin, bûyne gorkolên xwebixwetîyê... Hema em van deh pazdeh salên ku me hemûya ji nêzîk ve şahidî pê kirîye, wekî filmekê binin berçavê xwe...

Deh salên dawîya sedsala 20an dergehê azadîyê li ber Kurda vekir û êdî kivş bû ku sedsala 21an dê bibe sedsala Kurdan... Rejîma Seddam serê xwe, bi gotineke îronîk, li xîzê Kuweytê da û paşê jî çiqewimî, em hemû şahidên wan salan in... Kew bi darê ket û pêşengên polîtîk yên Kurdên Başûr ji jîyana koçerî û mişextîyê vegehrîn û Kurdîstana Başûr hate vegirtin ji destê rejîma Seddamî... Amerîka û cîhana rojavayê Kurdîstana Başûr bi kêşana paralela 36an wergirte bin ewlehîya xwe û êdî prosesa avabûna Kurdîstanê li parçeyê başûr dest pê kir... PDK û YNKyê, wekî du hêzên mezin xwe li navçeyên Bahdîna û Soran organîze kirin. Bi hevkarîya Amerîka û welatên Ewrûpayê û konjonktûra cîhanê 19yê Gulana 1992ê hîlbijartin hatin kirin û tam bi tarzê Kurdewarî parlement û iqtidareke “fiftî fiftî” hate damezrandin. Ji terkîba parlement û hukûmetê kivş bû ku tovên berhingarîyê dê şîn bibin û dîsa ve Kurd dê bi hev kevin... Gelek nekêşa di navbeyna PDK û YNKyê da şerê nifûz û iqtidarê dest pê kir... Di nîveka salên 90î da li ser hevdu cunta kirin, qiyamet li ser hevdu rakirin û em hemû pê dizanin ka çiqewimî bi serê hevdu înan û destkevtî başûr tûşî gelek tehlîkeyan kirin... Axir du merkez pêkhatin; Silêmanîye û Hewlêr... Ev duserîya başûr sîrayetî parçeyên dî yên Kurdîstanê jî kir... Terefdarîya du “hukûmetan” li nav polîtîka Kurdî da xwe kivş kir... Li milekê bi hevkarîya Amerîka û cîhana rojavayê û konjonktûra navçe û cîhanê û ji milekê ve jî bi fişara xelkê Kurd bi xwe, PDK û YNKyê xwe li çeperên xwe bi cih kirin, şerê hevdu sekinandin, belêm li hev jî nehatin...

Di wan deman da baş têtê zanîn ku dewletên cîran yên wekî Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê çend provakatorî û têkvedan kirin, şerê navxweyî gur kirin ku destkevtî başûr têkbibin ku ji bo parçeyên li bin destên wan nebe nimûne... Di wan şertan da mixabin ku tek û tinê hejmareke biçûk ya ronakbîrên Kurd yên ku bi rastî di xeta neteweyî da cih digirtin, hewilên bîrfireh û pîralî dane dest pê kirin ku di navbeyna

hêzên neteweyî da diyalog pêkbêt û ev şer û dozên navxweyî bi rêyên aştiyane bêne çareser kirin... Vê rewşa berbelav ku her gav potansiyela şerê navxweyî di nav xwe da disitirand, heta hilweşîna rejîma Seddam li 9ê Nîsana 2003ê û avakirina Iraqa nû dewam kir... Kurd bi hewildanên hêzên aştiyê yên navxweyî pêknehatin, lê Amerîkayê ew înan nik hev û hasilî sala par, 2005ê, parlement û hukûmetên yêkgirtî pêkhatin... Bi destê kê be ferq nake, encam bi xêr bû, li ser zemînekî tehisok jî be yêkîtiyê neteweyî li başûr derkete meydanê... Em hêvî dikin ku ev prosese pêş bikeve û saxlemtir bibe... Lê belê, ji ber ku sêkoşeka şeytanî, Tirkîye, Îran û Sûrîye, xirabkerîya xwe didomînin, rewş hêj jî gelek nazik e û sexbêrî û baldarîyê mezin dixwaze ku hemû Kurd li vê rewşê hişyar bin û rê nedin ajawe û têkvedanên ku dîsa rê li ber şerekî navxweyî veke...

Ber bi dawîya salên 90î da bi provakatorîya Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê, di navbeyna hêzên başûrî û bakur da şerê navxweyî derket û zerar û ziyaneke mezin gihande xelkê Kurd û hêzên polîtîk... Lê axir dîsa ve bîr û hissiyata neteweyî ser ji tengbînîyê stand û nermahîyek, qet nebe bêşerîyek pêkhat... Gelek ciwanên Kurd dîsa bi destê Kurdan hatin telifandin... Mîrov naxwaze wan demên reş û tarî bîne bîra xwe...

Lê vê gavê ew dem hatîye li paş xistin... Şuûra neteweyî kêm jî be pêş ketîye û xelk bi xwe êdî keysî nade ku hêzên polîtîk ciwanên Kurd bi hev bidin kuştin...

Belêm rewşa polîtîk ya navçeyê hêj jî ji aliyê bizava neteweyî ya xelkê Kurd ve tijî risk û tehlîke ye... Sêkoşeka şeytanî, alyansa Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê, di bin koordînatorîya Tirkîyeyê da, ji salên berê zêdetir aktîv e û ji sê alîyan ve êriş têtê kirin ku bizava neteweyî li bakur, li rojhilat û li başûrarojava bête fetisandin...

Iro, ji ber konjonktûra navçe û cîhanê û herweha di midê van 14-15 salan da, Kurdîstana Başûr ji ber ku xwe ji aliyê leşkerî û mekanîzmeyên dewletî ve gihandîye, organîze kirîye û dîsa hebûna Amerîkayê li navçeyê, şansî nade dewletên kolonyalîst yên cîran ku destkevtî parçeyê başûr yê Kurdîstanê têkbibin... Lê belê, plan û projeyên aloz kirinê, têkvedanê di her keysî da realizê dikin, nahêlin ku avadanîyêke rêkûpêk bête kirin...

Di van şertan da îştaha Amerîkayê bilind e ku xwe bigihîne Îran û Sûrîyeyê jî... Li goreyî projeya

Amerîkayê ya rojhilata mezin û demokratîzasyona navçeyê, Iran û Sûriye di nîveka polîgona lédana leşkerî ya Amerîkayê da ne... Ev rewşe keysên pozîtîv tîne ber bizava neteweyî ya Kurdistanê li sê parçeyên dagîrkirî da... Prosesa hilweşandina statukoya rojhilatanavîn ji Iraqê hatîye dest pê kirin û xuya ye dê bi Sûriye û Iranê bête domandin. Parçeyê başûr hate azad û rizgar kirin. Modelê federal, anjî konfederal, di nav Iraqa merkezî da jî be, hate ava kirin. Îro realîteyek e ku parçeyê başûr yê Kurdistanê dewlet e û eve di serê sedsala 21an da serkevîneke mezin û dîrokî ye... Li parçeyên dî jî serkevîtin, nav çî dibe bila bibe, kêmi vî modelî nabe...

Vê rewşa nû ji sê cepheyên ve êrişkarî zêde kirîye... Bi taybetî Tirkîye û Iran di warê leşkerî da jî destekeke mezin didine hev û bi hev ra û bi koordîne şerê hêzên çekdar yên bakur û rojhilat dikin. Gerçî di navbeyna hêzên çekdar û polîtîk yên bakur û rojhilat da jî koordînasyonê heye, lê axir du dewlet bi hemû îmkânên xwe ve êriş dikin ku têkoşîna li bakur û rojhilat bişkênin...

Di van şertên dijwar û nazik da, ma yêkitîya neteweyî ne hewce ye?.. Iro mixabin ku, ne li bakur, ne jî li rojhilat, di navbeyna hêzên neteweyî da, tifaqê danin alîyekê, dîyalog jî nîne... Iran jî, Tirkîye jî, li du cepheyên, li PKK û PJAKê û hêzên gerilla yên HPG û HRKYê didin, lê dîsa ve mixabin ku hêzên dî yên neteweyî, hem di çeperê şerê çekdarî da xuya nakin, hem jî ji tifaqê polîtîk û organîzativ dûr in... Li goreyî lojîka şer û têkoşîna neteweyî, divêt biçûk mezin hemû hêzên neteweyî bi armanca berjewendiyên neteweyî li ser muşterekên asgarî, mil bi milê hevdu ve dijî dijmin şer û têkoşîneke hevrayî bidin. Belê eve naête dîtin... Binas jî kîjan hêzê derdikeve hem giring e, hem jî ne asteng e...

Yên ku ji bo armancên hevrayî û têkoşîna neteweyî, tifaqê hewce dibînin, bi wê berpirsiyarîyê radibin û însiyatîva pêkînan tifaqa neteweyî hildigirin û di pratîkê da çî hewce be dikin... Di vî warî da zaafê kûr ya navxweyî heye di nav hêzên neteweyî yên Kurd da... Çu alî ber bi aliyê dî ve gavekê naavêjin, her alî ve gavê ji aliyê dî hêvî dike û di encam da nêzîkbûn pêknaêt...

Tabloya heyî ji aliyê tifaqa neteweyî ve baş xuya nake û eve hêz û cisaretê dide dijmin... Hindî ji destê dijmin têt, ji vê dijberîya hêzên neteweyî îstîfade dike û hetta hindî jê têt xirabtir jî dike... Nimûneyên vê yêkê di alozî û giriftariya di navbeyna hêzên bakur û başûr da hate dîtin... Hindî ji Tirkîye, Iran û

Sûriyeyê hat, şeqa di navbeyna hêzên Kurd da kûrtir û firehtir kirin...

Çare çî ye?

Di hemû şoreş û têkoşînên navneteweyî da jî hatîye dîtin ku dijî dijminê sereke cepheyekî herî pahn û berîn yê hêzên antî kolonyalist pêdivî ye û bêyî tifaqê neteweyî serkevîtin jî ne mumkun e... Ji dîndaran heta natûristan, ji baskê çepê heta baskê rastê, pêkve hemû hêz û dînamîkên neteweyî mecbûr in ku di armanca azadkirin û rizgarkirina netewe û welat da hev bigirin û hêz, şîyan û îmkânên xwe bi hev ra seferber bikin...

Esasen karakterîstîka şoreş û têkoşînên neteweyî û demokratîk jî, li ser organîzebûna hemû hêzên neteweyî reng werdigire... Karakterîstîka şoreş û têkoşîna xelkê Kurd jî, neteweyî û demokratîk e... Yê ku pêşengîya têkoşîna xelkê Kurd dikin, di programên xwe da li goreyî vî karakterîstîkê stratejî û taktîkên xwe formûle dikin û dixwazin bi vî çarçoveya teorîk xelkê organîze bikin û bi harmonîya van hêzên neteweyî têkoşîna di rê bibin... Lê mixabin di pratîkê da bereks hereket dikin...

Hal ew e ku, li goreyî vî formûlî, li her parçeyî, li goreyî şert û hewcehiyên xwe, divêt tifaqê neteweyî pêkbêt. Di seranserî Kurdistanê mezin da jî, divêt di navbeyna hêzên neteweyî da, hem koordînasyonê neteweyî hebe, hem jî hindî şert û îmkân dest didin, tifaqên nêzîktir bêne çêkirin...

Halîhazir, li seranserî Kurdistanê, organîzasyona ku bi armanca yêkitîya neteweyî hatîye damezrandin KNK ye û KNK her bi halê xwe yê îro jî di bin sihwaneya xwe da ji çar parçeyên Kurdistanê û meydanên diasporaya Kurdî, hêz û kesên neteweyî distirîne... Herçend hêzên ku di bin banê KNKYê da kom bûyî, ji aliyê îdeolojîk û polîtîk ve gelek nêzîkî hev bin jî, axir temsîla parçeyên xwe dikin... Ji ronakbîran heta polîtîkeran gelek kesên serbixwe jî di nav KNKYê da kar û xebata neteweyî dikin... KNK tesbîteke konkret û rasyonel dike ku ev terkîba heyî bi timamî temsîla hemû hêza neteweyî nake li seranserê Kurdistanê... Lê herweha hebûnek e, gavek e û KNK dixwaze ku terkîba xwe fireh û mezintir bike, qet nebe piraniyeke maqûl li bin banê xwe kom bike... Em hêvî dikin ku ev kombûn û rasthatine bibin wesîleya hevgerîtin û dîyaloga navxweyî ya Kurdan...

Di encam da, heke tete xwastin ku ji rewşa navçe û kojontûra navneteweyî bête îstîfade kirin û piştî

azadîya parçeyê başûr, parçeyên di jî azad û rizgar bikin, divêt tifaqeke xurt ya neteweyî bête pêkînan... Em baş dizanin ku KNK bi terkîba xwe ya heyî ya îro dûrî vê armancê ye, lê axir eve armanca KNKyê ye û ji bo vê armancê jî dixebite. Lê digel vê rastîyê, KNK dixwaze di gava pêşîn da qet nebe dîyalog û koordînasyonêke neteweyî bête pêkînan di navbeyna kes û hêzên neteweyî da li seranserê Kurdistanê... Evro eve mumkun e...

Di van şertan da, xelesa herî zêf parçeyê rojhilatê û parçeyê biçûk yê rojavayabaşûr e... Ji ber ku di serî da Amerîkayê û heta dereceyekê cîhana rojavayê adeta Îran ji ber çavê xwe derêxistîye û fişareke xurt jî heye li ser Îranê... Rejîma Îranê bi çêkirina çeka nukleer, hemû bal û awir kêşayne ser xwe... Di vê rikeberîya Îran û Amerîkayê da, rêza ku Kurd lê bin, rêza Amerîka û cîhana rojavayê ye... Mexsed û armancên wan çî dibin bila bibin, ku di esas da em baş dizanin û herweha têgihîştina wan û ya me ya li ser demokrasîyê jî dikare wekî hev nebe, belê di asgarî muştêreka hevpar da, ku ew jî dîsa ve demokrasî ye, divêt birêketineke hevrayî bêde dîtî û li goreyî wê pêkve gavan biavêjin. Amerîka û cîhana rojavayê di şertên îro da li rojhilatanêzîk û rojhilatanavîn dijî kevneperêsiya îslamîst û statukoya antî demokratîk ya heyî, şerê demokrasîyê didin û dixwazin navçe demokratîze bibe, statukoyên kevnare bêne hilweşandin û xelkê bindest yê Kurd jî bigihe azadîya xwe...

Di vê rikeberîyê da, di vî şerê ji bo demokrasîyê da, Kurd temsîla demokrasîyê dikin û temsîla antî demokrasîyê, ya totalîtarîzm û antî demokratîzmê Tirkîye, Îran û Sûrîye dikin. Gelek normal e ku xelkê Kurd di çeperê hêzên demokrasîyê da cihê xwe bigire... Berjewendîyên xelkê Kurd di vî cepheyê demokrasîyê da cih girtin e... Li parçeyan be, li tevayî Kurdistanê be, reftara rast ew e ku xelkê Kurd û pêşengên wî, bêyî kompleks, di rêza Amerîka û cîhana rojavayê da cihê xwe bigirin û ji alyansa demokrasîyê, ji bo armanca bizava neteweyî îstîfade bikin...

Em bawer dikin ku eve hissîyata we hemûyan îfade dike... KNK bi vê bîr û bawerîyê û di van şertên dijwar da, biçûk mezin, hemû hêzên neteweyî, ronakbîran, polîtikerên serbixwe û timamî xelkê xwe gazî tifaqa mezin ya neteweyî dike... Banê KNKyê hind mezin hatîye ava kirin ku cihê hemû hêz û dînamîkên neteweyî di bin da heye...

Rêya normal û maqûl ew e ku ji bo armancên kolektîv, hemû hêzên neteweyî di bin sihwaneya KNKyê da kom bin û bi hev ra kar û xebateke kolektîv bikin...

Ji kes û hêzên ku ji bo xelkê Kurd mafên herî kêr û nîzîm, mafên kesînî dixwazin, heta yên ku otonomîya kulturî, otonomîya polîtîk, federasyon, konfederasyon û serxwebûnê dixwazin, cihê hemûyan heye di nav baskên KNKyê da. Her plan û projeya ku di xêra xelkê Kurd da be, dikare di nav KNKyê da cih bigire. Kê an zêde, biçûk an mezin, hemû armanc, plan, proje û teklîfên ji teref kes û hêzên Kurd ve têne kirin, meşrû ne ji alîyê KNKyê ve û KNK xwudanîyê li hemûyan dike... KNK bi vê berpîrsiyarî û xweşbînîya herî fireh ve dergehê neteweyî ye û her ferd û hêza neteweyî dikare di nava KNKyê da cih bigire...

Li ber ronahîya felsefeya Ehmedê Xanî, em jî dibêjin: Çî dibî, çî reng dibî, çî hêz dibî, bi çî bîr û bawerî û ramanê dibî, ferq nake, bes ku demokratîk, humanîter û Kurd û Kurdistanî bî, were nav KNKyê...

Cihê me hemûyan di bin sihwaneya KNKyê da heye... KNK bi vê bîr û bawerîyê we hemûyan gazî bin banê xwe yê neteweyî dike...

KNK bang li we, li xelkê xwe dike ku, em hemû bi hev ra, mezinê mezintir bikin, rê nedin polarîzasyon û atomîzasyona hêza xwe ya neteweyî...

Heza mezin ya neteweyî, hêza dijmin biçûk dike, serkevtinê nezîktir dike...

KNK dikare vê hêza mezin ya neteweyî temsîl bike...

KNKyê ev şans, ev îmkân, ev şîyan û kapasîte heye û bang dike ku KNKyê mezintir bikin, daku ser ji dijmin bête standin...

Serkevtin ya yêkîtiya neteweyî ye...

Spas ku we em bi sebir guhdarî kirin...

Silav û rêz ji bo we hemûyan...

ROJAN HAZIM

08 Çirî 2006, yêkşemb, Stockholm...

Not:

Di kurtahîya muhtevîyata vê tekstê da, 30ê meha Îlonê, di kombûna eynî formatê da li Kölnê jî hate axivtin. Anku axivtina Kölnê li ber bûyer û qewimînên nû hate fireh kirin ji bo kombûna Stockholmê... [RH]

Kombûna Stockholmê endamên KNKyê Mela Hesên Nuzhetzade û Şoreş Reşî organîze kirin. Mela Hesên axivtina vekirinê kir, piştî wî jî Şoreş Reşî û Rojan Hazim axivtin.

Konseya Rêvebir ya KNKyê li 4ê meha 11an kombû

**Konseya Rêvebir ya KNKyê kombûna
xwe ya dawîyê ya sala 2006ê, li 4ê
Teşrînê [November], li Brukselê kir
û ev daxuyanîya li jêr jî ji bo bîr û
rehîya giştî belav kir.**

Konseya rêvebir di demekî wisa da kombû ku, li çaralî Kurdistanê, ji bilî pirs û pirsgerêkên sosyopolîtîk, sosyoekonomîk û sosyokulturel, xezeb û felaketa xwezayê jî hate ser û jîyan li xelkê me adeta kire cehnem. Eve çend roj in ku li Kurdistanê bi barîna baraneke giran lehî û lêmişt rabû û bû binasê zerar û zîyanên giran yên malî û canî. Di vê lehîyê da nêzikî 60 kesî mirin û hejmareke bilind ya birîndaran jî heye. Lehî û lêmiştê mal û avahî hilweşandin, gund û bajêr adeta ramalîn. Bi bihayê milyaran zerar û zîyana malî çêbû. KNK ji ber vê felaketa mezin xwezîya xwe ya derbazbûnê pêşkêşî xelkê Kurdistanê dike, serxweşîyê dide binemal û kesûkarên mirîyan û hêvîya saxîya birîndaran dike. Felaketeke hinde giran bi serê xelkê Kurdistanê hat, belê dewleta Tirk neçû hawara xelkê navçeyê û xemariyêke bi zanahî tercîh kir û adeta xelkê me terkî ber lehî û lêmiştê kujer kir. KNK vê reftara dewleta Tirk şermizar dike. KNK herweha bangî xelkê Kurdistanê dike ku hevkarîyêke xurt digel felaketdîtîyan bikin.

Ji piştî kombûna 1ê Ilonê were, bûyer û pêşhatinên giring û balkêş yên polîtîk rûdan li Kurdistanê. Her di serî da, pêşengîya bizava neteweyî ya xelkê Kurd li Kurdistana Bakur, PKK-KKKyê, bi teklîfa rêberê KKKyê Abdullah Ocalan, biryara agirbesê wergirt û ji 1ê Çirîyê pêve jî bi cih îna. Di roja

îlankirina agirbesê da jî KNKyê reftara xwe kivş kir û destek da agirbesê. Di şertên îro da aşkera ye ku bizava neteweyî ya xelkê Kurd û pêşengîya wê li bakur biryareke maqûl wergirtîye û em wekî KNK piştevanîya vê gavê dikin. Di serî da jî me bi zelalî got ku divêt dewleta Tirk jî bersiveke pozîtîv bide terefê Kurd ku ev gav di xêra xelkê Kurd, xelkê Tirk û herweha di xêra xelkên navçeyê da ye. Ji xwe ji ber vî keysê pozîtîv bû ku agirbesê li hemû dinyayê ji cihana humanîter jî destek stand, qebûliyêk dît. Belê mixabin ku heta îro jî terefê dewleta Tirk bersiveke pozîtîv nedaye xelkê Kurd, tam bereks şiddeta xwe domand û hema di van rojên piştî îlana agirbesê da 13 gerîllayên Kurd şehîd kirin. Xuya ye ku demên agirbesan bi rîzîkoyan ve tijî ne û bi taybetî terefê dewleta Tirk êrişkarî û provakatorîya xwe didomîne û ev polîtîka ji bo wan û xelkê wan jî xêrê naîne. KNK ji ber nazîkîya demê agirbesê hêvî dike ku hemû dînamîkên neteweyî li ser prosesê hişyar û baldar bin û destekeke xurt bidine hevdu ku planên ajawê û têkvedanê yên dewleta Tirk bêne betal û pûç kirin.

Bi vî demê agirbesê ve girêdayî, KNK bîr û bawerîya xwe ya li ser hewcedarîya tifaqa neteweyî dubare dike û dixwaze bala hêz û kesên neteweyî bikêşe ku bi berpirsiyarîya hevgirtinîya neteweyî rabin û rê li ber pêkhatineke fireh û mezin xweş bikin. Hem biserêxistina prosesa agirbesê, hem jî berterefkirina hemû êrişkarî û rîskên li dora bizava bi giştî neteweyî, bi yêkitîya neteweyî ve girêdayîye. Ji parçeyê başûr yê azad û rizgarbûyî heta hemû parçeyên dî, garantîya esasî ev hêza yêkgirtî ya navxweyî ye. Di maksîmûm dereceyê da ji dînamîkên derve îstîfadedekin jî dîsa ve bi vê yêkitîya navxweyî ve dikare bibe. KNK dixwaze herwisa bala bîr û rehîya neteweyî bikêşe ser êrişkarîya enîya antî Kurd ya dewletên Tirk, Iran û Sûrîyeyê. Ev hersê dewlet ji bilî êrişkarîyên xwe yên yêkane û hevrayî, digel Amerîka û cihana rojavayê jî bazarake kirêt li ser paşeroja xelkê Kurd û Kurdistanê dikin ku rê li ber demokratîzasyona rojhiltanavîn û hilweşandina statukoya xwe ya kevneperê bigirin. Ev enîya bêyûm, bi taybetî li nav Iraqê bi provakasyon û têkvedanên xwe ve, dixwazin Amerîkayê mecbûrî xwe bikin û xwastekên xwe bi Amerîkayê bidin qebûl kirin. Xwasteka wan ya hevpar jî yêk e: Alyansa Amerîka û xelkê Kurd bişkênin, qet nebe lawaz bikin. Bi vê rêyê, dixwazin pêşveçûna bizava xelkê Kurd dorpêç bikin, bi başûr ve bitixûb bikin û rê li ber pêşkevîtinê parçeyên dî bigirin. Ev

leyiza hersê dewletan bi serê xwe îro hewcedarîya yêkitîya neteweyî lezîntir dike. Şert û atmosfera îro jî îmkân dide ku di navbeyna dînamîkên neteweyî da diyalogê ber bi tifaqa navxweyî ve bête pêkînan. KNK hêvî dike ku dînamîkên neteweyî bi vê şuûrê bi rê bikevin û her bi çî reng û metodî be tifaqa neteweyî pêkbînin. KNK ji bo pêkînana tifaqa navxweyî çî hewcehî û fedakarî pêdivî be hazir e bike.

Digel pirs û pirsgirêkên polîtîk, herweha problemên sosyal yên navîni jî jîyana xelkê Kurdistanê tengav û bi êş û jan dikin. Di serê van problemên sosyal da jî, şiddeta li ser jinê heye. Di van rojan da kuştina jinan li Kurdistanê di serê rojevê da ye. Helbet binasên sosyoekonomîk, sosyopolîtîk û sosyokulturel rola sereke dileyizin di vî warî da. Dewleta kolonyalist ya Tirkîyeyê ji serî were gelek bi zanahî sîstemê eşîrî û feodalîyê li nav civata Kurd jînde hêla û vê polîtîka xwe didomîne jî. Li ser van adet û tarzên jîyana kevnare, teessûbîya dînî, nexwandahî, zihnîyeta bi salan ya mêrşahî ya di nav civata Kurd da, jîyan li jinê heram kir, kire jahr û mirin. Mêr û adet û zihnîyeta kevnepêrês ya civata Kurd, xwe kirin yêk û desthilata xwe li ser jinê ava kirin, jin kirin depê armanca kirêtîyên xwe. Barê giran yê “namûsê” danan ser milê jinê û bi lêdan, her reng şiddet û kuştinê jin kirin êxsîrê xwe. KNK her bi çî binasî be, şiddet û kuştina jinê neku tinê şermizar dike, mehkûm dike û bangî xelkê Kurd, pêşengên polîtîk, rêber û rênîşanerên civatê, yên dînî û ronakbîran dike ku her bi çî rengî be, rêyê li ber vê weşeta li ser jinê bigirin, bi daxuyanîyên şermizar û rûreşkirinê nemînin, mueyyîdeyekê biafirînin ku li ser vê bêperwatîya zihnîyeta mêrşahîya mêrê Kurd lêveker be.

Konseya rêvebir li ser kampanyaya ziman jî rawesta û dilşahîya xwe îfade kir ku xelkê Kurd li kampanyayê xwudan derketîye. KNK hêvî dike ku rêber, pêşeng û rênîşanerên hemû baskên civata Kurd, berpirsiyarîya xwe ya beramberî zimanê Kurdî bînin cih, li kampanyayê germtir bin, bizava edetkirina Kurdî axivtinê sist nekin, xurttir pêşve bibin. KNK herweha bangî pêşengîya polîtîk û demokratîk û bîr û rehîya navxweyî dike ku li ser astengîya ku ji makqanûna dewleta Tirk ve derdikeve, rawestin. Di serî da jî li ser bizava daneguhortina maddeyên 3yê û 42yê yên faşîstî yên makqanûna Tirkîyeyê bi aktîvî bête kar kirin. KNK ji hemû dînamîkên neteweyî daxwaz dike ku di vê xebata spesîfik ya daneguhortina du

maddeyên makqanûna Tirkîyeyê da, bi koordîneyeke neteweyî hereket bikin û mekanîzmeyên Yêkitîya Ewrûpayê jî serwext, agahdar û aktîve bikin.

04 Teşrîn [November] 2006, Bruksel

“... adet û tarzên jîyana kevnare, teessûbîya dînî, nexwandahî, zihnîyeta bi salan ya mêrşahî ya di nav civata Kurd da, jîyan li jinê heram kir, kire jahr û mirin. Mêr û adet û zihnîyeta kevnepêrês ya civata Kurd, xwe kirin yêk û desthilata xwe li ser jinê ava kirin, jin kirin depê armanca kirêtîyên xwe. Barê giran yê “namûsê” danan ser milê jinê û bi lêdan, her reng şiddet û kuştinê jin kirin êxsîrê xwe. KNK her bi çî binasî be, şiddet û kuştina jinê neku tinê şermizar dike, mehkûm dike û bangî xelkê Kurd, pêşengên polîtîk, rêber û rênîşanerên civatê, yên dînî û ronakbîran dike ku her bi çî rengî be, rêyê li ber vê weşeta li ser jinê bigirin, bi daxuyanîyên şermizar û rûreşkirinê nemînin, mueyyîdeyekê biafirînin ku li ser vê bêperwatîya zihnîyeta mêrşahîya mêrê Kurd lêveker be...”

“... Halîhazir, li seranserê Kurdistanê, organîzasyona ku bi armanca yêkitîya neteweyî hatîye damezrandin KNK ye û KNK her bi halê xwe yê îro jî di bin sihwaneya xwe da ji çar parçeyên Kurdistanê û meydanên dîasporaya Kurdî, hêz û kesên neteweyî distirîne... Herçend hêzên ku di bin banê KNKyê da kom bûyî, ji alîyê îdeolojîk û polîtîk ve gelek nêzîkî hev bin jî, axir temsîla parçeyên xwe dikin... Ji ronakbîran heta polîtîkeran gelek kesên serbixwe jî di nav KNKyê da kar û xebata neteweyî dikin... KNK tesbîteke konkret û rasyonel dike ku ev terkîba heyî bi timamî temsîla hemû hêza neteweyî nake li seranserê Kurdistanê... Lê herweha hebûnek e, gavek e û KNK dixwaze ku terkîba xwe fireh û mezintir bike, qet nebe piranîyeke maqûl li bin banê xwe kom bike... Em hêvî dikin ku ev kombûn û rasthatine bibin wesîleya hevgirtin û dîyaloga navxweyî ya Kurdan...”

Epîloga KNK Bultenê

Piştî kombûna giştî ya KNKyê, di kombûna yêkemîn ya konseya rêvebir da biryar hate dan ku bulteneke sê mehî bête amade kirin û weşandin. Mexsed ji vê bultenê ew e ku hem endamên KNKyê ji kar û kiryarên KNKyê, hem jî bîr û rehîya giştî ya Kurdistanê ji karûbarên KNKyê agahdar bikin.

Peryoda weşanê sê mehî hatîye plan kirin. Belê ji ber “seferberî û kampanyaya axivtina Kurdî” di meha Îlonê da, me hejmareke taybetî ji bo daxuyanî û banga kampanyayê amade kir û weşand. Hazirîya hejmara pêşîn jî dem girt û me di dawîya şeş mehan da amade kir û vaye weşand.

Piştî kombûna giştî, çî daxuyanîyên piştî kombûnên konseyê hatine dan û nivîsarên li ser kar û xebata KNKyê hatine nivîsîn, me di vê hejmara yêkemîn da komî serhev kirin û di yêk hejmarê da bi cih kirin. Di sala nû da, em dê bultenê her sê meha carekê di demê xwe da biweşînin.

KNK hêvî dike ku sala nû, sala 2007ê, ji bo xelkê Kurd û hemû xelkên Kurdistanê û herweha bo hemû xelkên cîhanê xêr û xweşîyê bîne.

Heta hejmara duyemîn bimînin di nav xêr û xweşîyê da...

Edîtor

Kanûn 2006

**“14yê Gulanê, roja
Cejna Zimanê Kurdî
dê wekî tradisyon hersal
bête pîroz kirin.”**

Ji daxuyanîya KKKyê

”... Vê dawîyê KNKyê jî îlan kirîye ku kampanyaya zimanî bidin dest pê kirin. Dîsa komîteya ziman û perwerdeyê ya KKKyê jî bangeke bi vî rengî kirîye. Nihe em wekî Konseya Rêvebir ya KKKyê gelek giring dibînin ku ev kampanya û bang pêkve di sewîyeya neteweyî da bêste dest pê kirin...”

*** * ***

Ji kampanyaya KNKyê

Gelî Kurdan,

Li Kurdistanê Bakur û meydanên dîasporayê jîyana zimanê Kurdî di dereceya alarma sor da ye. Zimanê Kurdî li bakur û dîasporayê kêmtê axivtin. Zordariya dewleta Tirkîyeyê têtê zanîn, belê herweha xemsariya xwe bi xwetî jî heye. Beramberî zordariya dewleta Tirkîyeyê û pêkve asîmîlasyonê, berxwedana herî mezin Kurdî axivtine.

Bang û hawara me ev e:

Kurdî biaxivin!

Bi îsrar Kurdî biaxivin!

Bi rik Kurdî biaxivin!

Komisyona Ziman û Perwerdeyê ya KNKye

"... Li ber ronahîya felsefeya **Ehmedê Xanî**, em jî dibêjin:
Çi dibî, çi reng dibî, çi hêz dibî, bi çi bîr û bawerî û ramanê
dibî, ferq nake, bes ku demokratîk, humanîter û Kurd û
Kurdistanî bî, were nav KNKyê...

Cihê me hemûyan di bin sihwaneya KNKyê da heye...
KNK bi vê bîr û bawerîyê, we hemûyan gazî bin banê xwe
yê neteweyî dike...

KNK bang li we, li xelkê xwe dike ku, em hemû bi hev ra,
mezinê mezintir bikin, rê nedin polarîzasyon û
atomîzasyona hêza xwe ya neteweyî...

Heza mezin ya neteweyî, hêza dijmin biçûk dike,
serkevtinê nezîktir dike...

KNK dikare vê hêza mezin ya neteweyî temsîl bike...
KNKyê ev şans, ev îmkan, ev şiyar û kapasîte heye û bang
dike ku KNKyê mezintir bikin, daku ser ji dijmin
bête standin...

Serkevtin ya yêkitîya neteweyî ye..."

Adres:

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK]
Rue Jean Stas 41 / 1060 Bruxelles, Belguque
Tlf.: 0032 2 647 30 84 / Fax.: 0032 2 647 68 49
www.kongrakurdistan.net/com/org